

MIZGİNİ YA
İSA MESİH
Lİ GORA YÜHENNA

(İNCİL)

GBV

1 Destpêkê de Kelam hebû. Kelam tev Xudê bû û Kelam Xudê bû. **2** Ew destpêkê de tev Xudê bû. **3** Her tişt bî navberiya wê çêbû, qet tiştek jî bê wê çênebû. **4** Heyat Wê de bû û heyat ronahîya insanan bû. **5** Ronahi lî tariyê de şewle dîde û tariyê Ew fehm nekîr, (bindest nekîr). **6** Mirovê ku aliyê Xudê'de hate şandîn, Yehya (peyxamber) derket meydanê. **7** Ev zîlam jî bo şehadet kırınê hat; da jî ronahîyê re şehadeti bîkırana û herkes bî destê wi iman bîkırana. **8** Ew bî xwe ne ronahi bû, lêbelê wi derbarê Nurê de şehadeti kır û jî bo vê yekê ew hate dinê. **9** Lê Nur'a hati dinê ya ku her insani ronahi dîke Nur'a heqiqi hebû. **10** Ew dinê de bû û dinê bî Wi hate hebûnê, feqet dinê Ew nas nekîr. **11** Ew hat cem yên xwe, feqet xelkê wi, (gelê wi) Ew qebûl nekîr. **12** Encax ew kesê ku iman bî Navê Wi anin û Ew qebûl kırın, Wi heq da wan hemûyan ku ew bîbin

zarokên Xudê. 13 Ew kes ne ji xwinê, ne ji irada bedenê û ne ji bî daxwaza insênin; encax ew ji Xudê welîdin.

14 Kelam bû insan û lı nav me'de jiyin kır. Me ji tıjibûna Wi ya bimbarek, merhemet û rasti ya Bav (yanê ya Xudê) û me bîlîndtîriya Lawê Xudê yê tenê dit. 15 (Hezretê) Yehya bo Wi şehadeti kır, gazi kır û wîsa got: „Ewê ku dû mîn re tê, ji mîn mezîntir, bîlîndtîr e. Jî ber ku Ew ji beri mîn hebû, û yê ku mîn behsa Wi kır Ev e.“

16 Me hemûyan ji tıjibûna Wi de merhemet lı ser merhemetê girt. 17 Şeriat bî destê (Hezretê) Mûsa hate dayinê, feqet lîtif, û heqiqet bî destê Isa Mesih hate dayinê. 18 Qet insaneki tu caran Xudê nedîtiye. Feqet Lawê Wi'yê delal yê ku bî Xwe ji Xudê'ye û hemêza Xudê'de ye, Wi Xudê daye nas kîrin ê.

Hatına Yehya peyxamber

19-20 Dema ku, Yahûdiyan ji Qudsa Şerif xeberçi şandın ba Yehya jê pîrskîrin û gotin, tu ki yi? Wê çaxê Yehya wîsa şehadeti

kır, wi aşkire qise kır û inkar nekîr – „Ez Mesih ninim got.“

21 Wê çaxê wan got, „lê tu ki yi? Tu İlyas i?“ Yehya got, „na“. Wan got, tu Ew Peyxamber i? Wi got, „na.“

22 Wê çaxê şiyandîyan, (xeberçîyan) gotin ku, „ma naxwe tu ki yi? jî me re bîbêje ku em xeberê bîdîn yên ku em şandîne“. „Tu jî bo xwe çi dîbêji?“

23 Yehya (peyxamber) got ez ew dengim, ewê ku mina „Yeşaya (peyxamber) dîbêje rê'ya Xudan rast, (dûz) bikin, ew dengê ku çolê de bo wi bang dîke.“

24-25 Hîn kesên Fêrisiyan ji Yehya're gotin, tu Mesih nini, İlyas nini û ew Peyxamber ji nini, çıma tu vaftiz dîki?

26 Yehya (peyxamber) wan re wîsa got: „Ez bî avê vaftiz dîkim, feqet lî nav we de yeki dîn heye, yê ku hun nas nakîn. **27** Yê ku lî dû mîn re hat, Ew e. Ez laiq ninim ku bendê çarixê Wi vebikim.“ **28** Vana Hemû aliyê bajarê Şeriay lî Bêtanyê'de, suna ku Yehya (peyxamber) vaftiz kırıbû lî wê derê hatin çêbûnê.

Berxê Xudê

29 Rojek arê de derbaz bû, Yehya (peyxamber) dit ku Isa ber bî wi hat û wi wîsa got: „Mêze, Berxê Xudê yê ku gunehêن dînê jî ortê heltine! 30 Yehya bo xwe got, lî dû mîn re yeki dîn tê, Ew jî mîn hêjatîr e. Jî ber ku yê mîn gote Ew jî berî mîn hebû ev Ew e, (yanê Isa'ye). 31 Mîn Ew nas ne dîkîr, feqet bona ku Israil Wi nas bîke mîn bî avê vaftiz kîr û hatîm.“ 32 Yehya (peyxamber) şehadeta xwe wîsa domand (dewam) kîr: „Mîn dit ku Rîh'ê bîmbarek jî jor'de mina gogerçinekê hate xwar û ser Isa Mesih sekini. 33 Mîn Ew nas ne dîkîr. Feqet yê ku ez şandîm ku bî avê vaftiz bîkim, Wi got ku Rîh'ê bîmbarek lî ser ki dayne û bise-kîne, yê ku bî Rîh'ê bîmbarek vaftiz bîke, Ew e. 34 Mîn ji dit û şehadeti kîr û got, Lawê Xudê Ev e.

Şagırtê Isa yêن pêşî

35 Dortıra rojê Yehya peyxamber disa lî tev du şagırtê xwe bû. 36 Isa lî wê derê're der-

baz bû, Yehya mîze İsa kîr û got, „Mîze Berxê Xudê!“

37 Dema ku wan du şagirtan ev gotine bîhistin, ew lî dû İsa çûn. **38** İsa dema ku vegeriya, dit ku ew lî dû wi têñ. İsa jî wan pîrsi û got, „hun-lı çı digerin?“

Wan jî jî İsa re got: „Tu lî kuderê rûdını Xudan?“ (yanê Rebbi) Mana Xudan, Mamos-te ye.

39 İsa jî wan re wîsa got, „Werîn û bîbinin.“ Ew lî tev İsa çûn û şuna ku İsa rûdınışt ditin û wê rojê ba İsa man. Saet wi çaxê çar bû. **40** Yê ku dengê Yehya (peyxamber) bîhistin û lî dû İsa çûn, ew yek bîrayê Simon Petrûs, Andrêya bû. **41** Andrêya beri bîrayê xwe Simon dit û jê re got, „Me Mesih dit.“ (Mana Mesih mesh kîrin e)

42 Andrêya bîray xwe bir cem İsa. İsa mîze wi kîr, jî wi re got, „Tu lawê Yûhenna Simon i. Dû vê rojê re navê te Kifas e.“ (Mana Kifas zînar e).

43 Dortıra rojê İsa niyet kîr ku, bîçe bajare Celilê. Wi mîrovek dit navê wi Filipûs bû û İsa, Filipûs re got, „lî dû mîn were.“

44 Filipûs ji bajare Andrêya û Petrûs bû jî

bajarê Bêtseyda. **45** Filipûs Natanyel dit û jê re got, „Ewê ku Mûsa (peyxamber) derbarê wi de nîvisiye Şeriatê de û yê ku peyxamberan ji behsa wi kırine, Lawê Üsîv, Isa'y Nisreti me dit.“

46 Natanyel, jî Filipûs pîrs kîr û got: „Jî bajarê Nisretê tışteke rînd, (qenc) derdikeve?“ Filipûs got, „Were û bîbin e.“

47 Isa, dit ku Natanyêl ber bî Wi hat, wê çaxê jî bo wi wîsa got, „Mêze, Îsrail kê heqiqi! Lî dîlê wi de hile tune.“

48 Natanyel got, „Tu mîn jî kû nas dîki?“ Isa, got: „Wexta ku Filipûs hê bang te ne-kîribû, mîn tu bîn dara hêjirê de diti.“ **49** Natanyel got, „Xudan, tu Lawê Xudê û padîşahê Îsrail'i!“

50 Isa jê re got, „bona ku mîn jî te're got mîn tu bîn dara hêjirê de diti, tu iman dîki? Tê hê jî van tıştana girtir û mezîntir tıştibini.“ **51** Isa got, Ez we re bî rasti bî rasti dîbêjîm, ezman vedîbe û Mîlyaketên Xudê, lî ser Lawê insan de bîlind dîbin û têne xwar; hun jî wi bîbinin.“ (Mana Lawê insan, Isa Mesih'e.)

Mûcîza İsa ya pêşi

2 Roja sisêyan gunde kê bajarê Celilê de gundê Kana de dawatek hebû. Dayêka İsa lı wê derê bû. **2** İsa û şagirtên wi ji hatîbûn dawet kîrin. **3** Wexta ku şerab xelas bû dayêka İsa, ji wi re got, „Şerab xelas bû.“

4 İsa got, „Jînîk te çi ji mîn e? Saeta mîn hê nehatiye.“

5 Dayêka İsa, kesê ku xizmet dikîrin ji wan re got, „İsa ji we re çi bêje wê bikin.“ **6** Bo edeta paqij bûna Yahûdiyan, lı wê derê şeş kûpêñ kevir hebûn ku her kûpekê de heyştê litir heta sed û bist litir av cih dibû. **7** İsa ji xizmetçîyanre got, „Kûpan bî avê tiji bikin.“ Wan kûp heta lêvîka re tiji kîrin. **8** İsa dû re ji xizmetçîyanre got, „nîha ji ji vina bigîrin û ji serdarê dawatê re bibin.“

Wan ji bîrin. **9-10** Serdarê dawatê ew ava ku bû şerab tam kîr. Wi ne zani ku ew şerab ji kû hatiye, feqet xizmetçiyê ku av ji kûp de derxistibûn, wan dizaniya. Serdarê dawatê bang zava kîr û got, „xelk pêsi şeraba rînd dîde, dema ku zehf vexwarîn, ya ne rînd

dîde. Feqet te şeraba rînd heta nîha hilan-dîye.“

11 İsa ev mûcîza xwe ya pêsi dî gundeke bajarê Celilê de, dî gundê Kana de çêkîr û qudra ta xwe nişan da. Şagırtên Wi ji iman bî Wi anin.

İsa tucaran jî ibadetxanê dîke der

12 Dû wê rojê re, (jû pê ve re) İsa, dayêka İsa, bîrayêni wi û şagırtên Wi bî hev re çûn Kefernahumê û çend rojan lî wê derê man.

13 İda Yahûdiyan ya derbazbûnê, (yanê ya pasoxê) ji nêzik dîbû. İsa ji çû Qudsa Şerifê. **14** Lî wê derê dewar, mîh û lî tev yên ku gogerçin dîfîrotin (tucar) rûniştibûn û pere hûr dîkirin. İsa ji ew ditin. **15** Wi ji bendikan qamçiyek çêkîr hemû, tev dewar û mîhêni wan ji wê kîr der, yên ku pere hûr dîkirin perêni wan rijand maseyêni wan ji gêr kîr. **16** Yên ku gogerçin dîfîrotin, İsa ji wan re got, „vana jî vê derê ra bikin, mala Bavê mîn nekin malek ya ticaretê!“

17 Wê demê şagırtên wi ew yeka ku (kitîba bimbarek) de hatiye nîvisin anin bira xwe

„Xireta ku mîn jî bo mala te kîr, mîn dîxwe xîlas dîke.“ **18** Yahûdiyan jî Isa pîrs kîrin, „Madem ku tu va tîstan çêdîki, tu mûci-zekê çawa nişanê me bîdi?“

19 Isa wîsa got: „Vê İbadetxanê hîlşinîn, ez wê sê rojan de disa çêbikim.“

20 Yahûdiyan, Isa re gotin, „Ev ibadetxane çel û şeş salan de hate çêkîrin, ma tu wêna sê rojan de çêdîki?“

21 Feqet İbadetxana ku Isa got, ew bedena wi bû. **22** Dema ku Isa jî mîrînê ra bû, şagirtên wi ev gotine, anin bira xwe û iman bî Kelama Isa û bî nîvisêñ bimbarek anin.

23 Bajarê Qudsa Şerif de dema cejna (ida) derbazbûnê de Isa zehf mûcize çêkîr û ew kesêñ ku ev mûcize ditin, iman bî Navê Isa anin.

24 Feqet jî ber ku Isa dîlê hemû insan an nas dîkir, bî wan baweri nedîkir. **25** Derbarê insan de qet ihtiyac tîne bû ku yeki jî Isa re tîştek bigota. Jîber ku wi tîştê dîlê insan de derbaz dîbûn dizaniya.

3 1-2 Serdarek yê Yahûdiyan bî navê Nî-kodim de hebû. Ev mîrov Fêrîsi bû, (yanê mîrovekê ilmdar bû), ew şevekê hate cem Isa û jî wi're got, „Xudan, em dizanın ku tu mamoste yi û Xudê tu şandiyi. Jîber ku eger Xudê lî tevê nebe, qet kesek nikare van mûcizeyên ku tu çêdiki, çêbîke.“

3 Isa jî wi re wîsa got: „Ez jî te re bî rasti bî rasti dîbêjîm, heta ku insanek jî nû ve newelide nikare padişahiya Xudê bibine.“

4 Nikodim, jê pîrs kîr, „Mîrovê ku kal (êxtî-yar) bûye çawa dikare jî nû ve bîwelide? Dikare ku disa bîkeve rehma, (yanê zîkê) dayêka xwe û disa were dinê?“

5 Isa wîsa got: „Jî te re bî rasti bî rasti dîbêjîm, heta ku insanek jî avê û jî rîh de newelide, nikare ku bîkeve padişahiya Xudê. **6** Yêñ ku jî bedenê welidîne beden ìn û yêñ ku jî Rîh welidîne Rîh ìn. **7** Şaş nebe ku, mîn jî te're got hun gerek jî nû ve bîwelidin. **8** Ba kijan aliyê de bîxwaze wîsa tê; tu dengê wê dikari bîbihizi, feqet jî kû ve tê û dîçe kû derê tu wê nîzani. Hemû kesê ku Rîh'de welidîne ji wîsane.“

9 Nikodim jî Isa pîrs kîr û got: „Vana çawa

dîkarin çêbin?“ **10** İsa jî wi re wîsa got: „Tu mamosteyê Îsrail i û disa ji tu van tiştan fehm naki?“ **11** Te re bî rasti bî rasti dîbêjîm, em tiştê ku dizanın dîbêjin û tiştê ku me dit wan şehadet dîkîn û hun şehadetiya me qebûl nakın. **12** Dema ku mîn jî we re behsa tiştê dinê kîr we iman nekîr, wê çaxê eger ez behsa tiştê ezmani bîkim hunê çawa iman bîkîn? **13** Jî xeyri Lawê Însan yê ku jî ezman hatiye xwar qet kesek derneketiye ezmanan. **14** Çawa Mûsa (peyxamber) dî çolê de mar bîlînd kîr, gerek Lawê Însan, (yanê İsa) ji wîsa bîlînd bîbe jor. **15** Wîsa ku, hemû kesê ku iman bî Wi binin, bigihijin heyata, (yanê jiyana) abedin.

16. Çimki Xudê evqas pîr (zehf) hez jî dinê kîr ku, Lawê xwe yê delal û tenê da, (yanê fedâ kîr). Wîsa ku, yên iman bî Wi binin qet kesek jî wan mehf nebîn, feqet hemû bigihêñ jiyana abedin. **17** Xudê Lawê xwe neşand dinê ku, ew hukum lî dinê bîke, Ew şand ku dinê bî wi xîlas bîbe. **18** Ew kesê ku iman bî Wi binin mehkum nabîn; feqet yê ku iman bî Wi nekîrin, ew jî xwe hatîne hukum kîrin. Jîber ku iman bî navê

Lawê Xudê'yê delal û tenê nekırîne. **19** Hukum ji ev e: Ronahi hat dînê, feqet insanan ji ronahiyê zêdetir ji tariyê hezkırın. Jiber ku xebatêن wan xırab bûn. **20** Her ki xırabiyê dîke, ji ronahiyê nefret dîke da ji bo ku xebatêن wi eyb nebin ne werin ronahiyê. **21** Feqet yê ku xebatêن wi rîndin ji bo ku xebatêن wi xuya bikin, ku wi bî Xudê re kîriye ew tê ronahiyê.

Şehadet kırına Yehya (peyxamber)

22 Pışti vê yekê İsa û şagirtên xwe hatin diyarê Yahûdiyê. İsa midetkê lı tev wan lı wê derê dîma û vaftiz dîkir. **23** Yehya (peyxamber) ji nêzikê Salimê, bajarê Aynonê de vaftiz dîkir. Çimki lı wê derê zehf av hebû. İnsan dîhatin û vaftiz dibûn. **24** Yehya (peyxamber) hê nehatu heps kîrin. **25** Wê sîrê de navbera şagirtên Yehya (peyxamber) û Yahûdikê de derbarê paqîj bûnê de gengeşi derket. **26** Şagirtên Yehya (peyxember) hatin ba Yehya û gotin „Mamosta“, „Yê ku aliyê çemê Şeriay de lı tev te bû, yê ku te derbarê Wi de şehadeti kîr, va

ye ew mirov vaftiz dîke û herkes ji tere ba Wi.“ (Wan ev bo İsa Mesih got).

27 Yehya (peyxamber) wîsa got: „Dema ku jorde, (yanê ji aliyê Xudê'de) tiştek neye dayin, kesek nikare tiştekê bistine. **28** Mîn got ez Mesih ninim, lîbelê ez xeberçiyê Wi me û hun ji şehidê van gotinê mîn in.

29 Bûk ya kê ye, zava ji Ew e. Lîbelê yê ku ba zava dîsekîne, dostê zavê ye û dema ku ew dengê zava dibihize, zehf kêfxweş dibe. Eşqa mîn ji bî vi awayi hat temam kîrin.

30 Ew gerek mezin bîbe û ez ji piçûk bîbim.

31 Yê ku jor de hatiye xwar, ji herkesê bîlîndtir e. Yê ku ji dînê ye dînyewi ye û behsa, (qala) dînê dîke. Yê ku ji ezmin de hatiye xwar, lî ser herkesire ye. **32** Wi çi ditiye û çi bîhistiye ji wi re şehadeti dîke, lî belê şehadeti ya wi kes qebûl nake. **33** Yê ku şehadeti ya Wi qebûl dîkîn, wan erê kîmrîne ku Xudê heqiqet e, (rastiye). **34** Ew kesê ku Xudê şandiye, Ew gotinê Xudê dîbêje. Çîmki Xudê, Rîh bî pivandinê nadî.

35 Bav, Law hez dîke û her tişt daye dest Wi. **36** Yê ku iman bî Law bine jiyana wi ya abedin heye. Lî belê yê ku imanê bî Law

neke ew jiyanê nabine lê belê xezeba
Xudê lî ser wi dîmine.

4 1-3 Fêrisiyan bîhistin ku Isa ji Yehya (peyxamber) zîdetir şagirtan qezenc dîke û vaftiz dîke. Hal bû ku Isa bî xwe vaftiz nedikir, şagirtên Wi vaftiz dikirin. Dema ku Isa ev zani ji Yahûdiyê weqetiya û disa çû bajarê Celilê. 4 Û lazim bû ku ew lî nav bajarê Semiriyê re derbaz bîbûya.

5 Bî vi awayi hat bajarki Semiriyê navê wi Sihar bû. Ew der nêzikê erdê Üsiv (peyxamber) bû ew erdê ku bavê wi, Yaqup (peyxamber) dabû wi. 6 Bira (Qûya) Yaqup (peyxamber) ji lî wêderê bû. Bona ku Isa rîwitiyê de westayi bû, cem birê rûnişt. Saet ji devdevi dîwazdeh bû. 7 Jînîk ji Semiriyê hat ku avê bîkışine. Isa ji wê re got, „avê bîde mîn, ez vexwîm.“ 8 Şagirtên Isa ji bo kırina xwarinê çûbûn bajêr.

9 Jînika Semiriyê ji Isa re got, „Tu Yahûdi û ez ji jînîkek Semiriyi me, bî çî awayi tu ji mîn avê dîxwazi?“ Çîmki eleqadar kê Yahûdi ji xelkê Semiryê re tune.

10 Isa ji jînîkê re wîsa got: „Eger ku te xela-

ta Xudê û yê ku jî te re dîbêje avê bîde mîn nas bîkirîna û bîzanîna yê ku lî tev te qîse dîke, ki ye, te wê jî Wi av bîxwasta, Wi ji wê ava jiyanê bîdana te.“

11 Jînîk got, „Efendi“, „te re tîştekê ku tu pê avê bîkişini tune û bir ji kûr e; jî kû derê ava jiyanê bî te re heye? **12** Ma tu jî kalîkê me Yaqup peyxamber mezîntir i? Wi ev bir daye me, bî tev law û dewarêن xwe ji jî vê avê vexwarîn.“

13 İsa wîsa got: „Ki jî vê avê vexwe, ew disa ti dîbe. **14** Feqet ki wê ava ku ez bîdîm vexwe tu caran ti nabe. Ava ku ez bîdîm dî hundurê wi de jî bo jiyana abedin dîbe kaniya ku dîherîke.“

15 Jînîkê got“ „Efendi“, „vê avê bîde mîn ku ez ne ti bîbîm û ne ji bona av kîşandînê heta bî vê derê werim.“

16 İsa, jînîkê re got, „here gazi mîrê xwe bîke û were vê derê.“

17 Jînîkê got: „Mîrê mîn tune.“ İsa jî jînîkê re wîsa got, „bona ku te got mîrê mîn tune, te rast qîse kîr. **18** Çîmki, „Tu bî pênc mîran re zewîciyi. Ev mîrê ku tu nîha tevê dîsekîni ji mîrê te nine. Te rasti got.“

19 Jînîkê ji Isa re got: „Efendi, ez dîbinim ku Tu peyxamber i. **20** Kalîkên me lî vi çiya de ibadet kîrîn, û hun dîbêjîn ku şundê ibadet kîrînê Qudsa Şerif e.“

21 Isa ji wê re wîsa got: „Jînîkê, bawer bî mîn bîke, saet tê ku, Bav re (yanê Xudê re) ne lî wi çiyayi û ne ji lî Qudsa Şerif de hun ibadet bîkîn! **22** Hun ibadet dîkîn û nîzanîn ku jî ki re, em ibadet dîkîn û zanîn ku jî ki re dîkîn. Çîmki xîlasi ji Yahûdiyan e. **23** Lî belê yêñ ku Bav re, (yanê Xudê're) ji dîl ibadetê rîh'de û heqiqetê de dîkîn ew saeta tê û ew saet nîha ye. Bav ji lî wan dîgere yêñ ku wîsa ibadetê jê re dîkîn. **24** Xudê Rîh e, ew kesê ku jî wi re ibadet dîkîn ji gerek bî rîh û bî heqiqetê bîkîn.“

25 Jînîkê ji Isa re got, „Mesih yê ku hatiye mesh kîrînê, ez zanîm ku ew wê were, û Ew wê derbarê her tiştê de xeberê bîde me.“ **26** Isa got, yê ku bî te re qîse dîke ez, Ew im; (yanê Mesih Ez'im got!)

27 Wê demê şagirtên Isa hatin. Jî ber ku Isa bî jînikekê re qîse dîkir ew şas man. Lî bele disa ji qet kesi, „Isa re negot ku tu çi

dixwazi?“ an ji, „Tu çîma bî wê jînîkê re qise dîki?“

28-29 Dû re jînîkê kûzê avê cih hîst çû bajêr û xelkê re wîsa got: „Werin, mîrovê ku her tîştê ku mîn kîriye ji mîn re got bîbinin. Ecêba Mesih Ev e?“ **30** Xelk ji bajêr derket dest pê kîrin û berbi Îsâ hatin.

31 Wi çaxê şagirtên Îsa, rîca kîrin û gotin, „Xudan, nan bîxwe!“

32 Ema Îsa got, „Xwarînek mîn heye, hun wê nas nakin.“

33 Şagirtan ji hevûdu pîrs kîrin û gotin: „Ecêba kesi ji Wi re xwarîn anîye?“

34 Îsa wan re got, „xwarîna mîn ewe ku, xwastîna yê ku ez şandîm binim şunê û karê Wi temam bikim.“ **35** „Hun, nabêjin ekîn çîninê re hê çar meh hene? Va ye, ez ji we re dîbêjîm, serê xwe bîlind bikin û mîze zeviyan bikin. Ekîn zer bûne û çîninê re hazır in! **36** Bona yê ku ajotîye û yê ku dîçine bî hev re dîlgeş bîbin, yê ku dîçine ucreta xwe digire û ji bo jiyana abedin ji ekînê top dîke.“ **37** Ew gotîna ku, „Yek dajo û yeki dîn ji dîçine, dî vê yekê de raste. **38** Mîn hun, bo çînîna mehsûlek ku

we emeg jı bo wi xerc nekîr şandın. Hîne
dîn emek dan, hun jı ketin nav emegê wan
de.“

39 Dî wi bajari de gelek kesên Semiriyê lî
ser gotına jînîkê jı ber ku wê şehadeti kîr û
got, „her tiştê ku mîn kîriye Isa jı mîn re
got“ iman bî Isa anin. **40** Xelkê Semiriyê
hatîn cem Isa û jê rîca kîrin ku Ew lî cem
wan bisekîne. Ew jî lî wê derê du rojan ma.
41 Ser soza wi hê gelek kesên dîn ji hatîn
imanê.

42 Evana jî jînîkê re digot: „Êdi sebeba
imana me ne bî gotına te ye.“ „Me jî bî
guhê xwe bîhist û em dizanîn ku Isa xîlas-
karê dînê yê rast e (yê heqîqi ye.“)

Isa lawê memûr kê sax dîke

43 Pışti van du rojan Isa jî wê derê weqe-
tiya û çû Celilê. **44** Isa bî xwe, şehadeti kîr
ku, peyxamberek dî Welatê xwe'de ne bî
qedr e. **45** Dema ku Isa hat bajarê Celilê,
xelkê Ew rînd pêşwazi kîr. Çîmki ew jî çû-
bûn idê û her tiştê ku Isa dî Qudsa şerif de
kîribû wan ji ew ditibûn.

46 İsa disa, hat gundê Kana yê bajarê Celilê şûna ku wi jî avê şerab çêkîribû. Lî wê derê mêmûrek yê Padişah hebû. Lawê wi Kefernahumê de nexweş bû. **47** Mirov, dema ku bîhist İsa jî Yehudiyê hat bajarê Celilê, çû cem İsa û jê rîca kîr ku ew were lawê wi yê ku ber mîrinêbû sax bîke.

48 Wê demê İsa jî wi memuri re got: „Hun heta alamet û nuwaze nebinin imannakın.“

49 Memurê Padişah jî İsa re wîsa got, „Efendi, jî beri ku lawê mîn bîmire were xwar!“

50 İsa got, „Here, lawê te dîji.“

Mirov iman bî gotına İsa ani û çû. **51** Dema ku ew hê rê de bû xulamên wi berbî wi hatîn, xeber danê û gotin lawê te rînd (sax) bû. **52** Mirov jî wan pîrs kîr û got, lawê mîn kijan saetê de rînd bû. Wan ji wîsa got: „Duh nivro saet yeki de agîrê wi daket.“

53 Bav fehm kîr ku, ev ew saeta ku İsa jî wi re gotibû ku, „lawê te dîji“ ew saete ye; û ew bî temamê xelkê mala xwe ve hatîn imanê. **54** Dema İsa jî Yahûdiyê hat Celilê, ev mûcîza dîduyan bû ku Wi çêkir.

İsa, kûdê hewzê de baş dile

5 Pışti van tiştan idek ya Yahûdiyan hebû û Isa çû Qudsa şerifê. **2** Lı Qudsê de lı cem wi deriyê jê re deriyê miyan dahat gotin, hewzek hebû bî zimanê İbrani jê re dîgotin Beythesta; pênc hewşên wi hebûn. **3-4** Lı wê derê kesên kor yên kûd yên falinc û komekê zêde ya nexwaşan radızan. **5** Lı wê derê mirovek nexweş hebû ku si û heyş sal bû ew nexweş bû. **6** Isa dit ku ew mirove lı wê derê razaye û Isa dizani ku ew jî wexteke dırêj ve nexweş bû, jê pîrs kîr û got: „Tu dixwazi baş bîbi?“ **7** Wi mirovê nexweş wîsa got: „Efendi, dema ku av pêl dîde (çelqin dile) kesê mîn tune ku mîn danin lı nav avê, dema ku ez dixwazîm bîkevîm nav avê, jî beri mîn yên dîn dîkevin nav avê.“ **8** Isa jî wi re got, „Rabe doşeka xwe top bîke û bîmeşe.“ **9** Ew mirov tam wê demê de baş bû û doşeka xwe top kîr û meşîya. Ew roj roja septê bû. **10** Jî ber vê yekê Yahûdiyan jî wi mirovi re gotin, „iro roja Septê ye doşeka xwe top neke, çımkî ew caiz nine jî bo te.“

11 Ema mirov jı wan re wısa got: „Ew mirovê ku ez baş kırım, jı mın re got, doşeka xwe top bıke û bımeşe.“

12 Jê pırs kırın û gotin, „mirovê ku jı te re got doşeka xwe top bıke û bımeşe ki ye?“

13 Mirovê ku baş bûbû nezani ku Ew ki ye. Çımkı ew der zehf sıxlet bû û İsa jı wê derê xwe dabû aliki. **14** İsa dû re ew mirov ibadetxanê de dit. Got, „mêze tu baş bûyi. Edi guneh neke ku tıştek hê xırabtır neyê serê te.“

15 Ew mirov çû ba Yahûdiyan û jı wan re got, ew mirovê ku ez baş kırım İsa ye.

16 Bona ku İsa roja Septê tıştên wısa çêkîr Yahûdiyan zulum lı Wi kırın. **17** Feqet İsa jı wan re wısa got: „Bavê mın heta nıha dixebite û Ez jı dixebitím.“

18 Jı bo vê yekê Yahûdi hê pêtir bo kuştına İsa dixebitin. Çımkı İsa tenê bı xırab kırına roja Sebtê nema bû, lê wi got Xudê bavê mın e û Wi wısa xwe jı bı Xudê re kır yek.

İsa heyatê, (yanê jiyanê) dıde

19 İsa jı Yahûdiyan re wısa got: „We re bı

rasti bı rasti dıbêjım, gava ku Law kar û xebata Bav nebîne bı xwe û xwe qet tişte-kê nîkare bîke. Bav çi bîke lav ji wê tiştê dîke. **20** Çimki Bav ji Law hezdîke û hemû xebata xwe nişanê Law dide. Ber ku hun xwe şas bikin, Ew ji va tiştana girtir tiştan nişanê wi bîde. **21** Bav, (yanê Xudê) çawa dîkare mîriyan rabîke û jiyanê bîde wan, Law ji wîsa bo ki bîxwaze jiyanê dide wan. **22** Bav kesi hukum nake, Wi hemû xebata hukum daye Law. **23** Wîsa ku ew kesê ku Bav dîdîn şeref kîrin Law ji bîdîn şeref kırınê. Yênu ku şeref nadîn Law, ew şeref nadîn yê ku Law şandiye Bav ji (yanê Xudê ji). **24** „We re bı rasti bı rasti dıbêjım, ew kesê ku gotinênen mîn bîbihizîn û iman bı yê ku ez şandîme binin jiyanâ wan ya abedin heye. Hukum ji kesen wîsa nabe, lê ew ji mîrinê derbazê jiyanê bûn e. **25** We re bı rasti bı rasti dıbêjım saet tê ku mîri wê dengê Lawê Xudê bîbihizîn û yênu ku bîbihizîn ji wê bijin û ew saet nîha ye. **26** Çimki çawa ku Bav de jiyan heye, Wi ev selahiyet daye Law ji. **27** Selahiyeta hukum kîrinê ji daye Law. Çimki Ew Lawê İnsan e. **28** Jı bo vê

şaş nebîn. Hemû kesê ku mezelê de ne dengê Wi bîbihizîn, ew saet tê. **29** Û ew ji mezelên xwe derdikevin der. Yênu ku rindi kırine bo jiyanê û yên ku xirabi kırine ew ji bo hukum kırınê radıbin.“

İsa re şehadeti

30 İsa got: „Ez ji ber xwe nîkarım tu tıştê bikim. Ez çawa dîbihizim wîsa hukum dîkim û hukmê mîn ji raste. Çîmki ez ne lî armanca xwe dîgerim, lê belê ez lî armanca yê ku ez şandime dîgerim. **31** Eger ku ez bo xwe şehadeti bikim, şehadetiya mîn rast nine. **32** Feqet yeki dîn heye ew ji bo mîn şehadetiyê dîke. Ez dizanım şehadeta ku Ew ji bo mîn dîke rast e. **33** We mîrov şandîn ba Yehya (peyxamber) û wi ji heqiqetê re şehadeti kîr. **34** Lî belê şehadetiya ku mîn qebûl kiri ne ji insanana, encax ji bo hûn xîlas bîbin ez vana dîbêjîm. **35** Yehya (peyxamber), mina çîra kê vêketi, şewle dîde. We wxeste ku şewla wi de, (yanê ronahîya) wi de midet kê şabîbin. **36** Feqet şehadetek ya mîn heye, ew ji ya

Yehya (peyxamber) hê mezintir e. Ev kârên, (xebatê) ku ez dîkim, yên ku Bav dane mîn, ew ji ji bo mîn şehadetiyyê dîkin, ku Bav ez şandım e. 37 Bav, Yê ku ez şandîme, Wi ji bo mîn şehadeti kîriye. We qet zeman kê ne dengê Wi bîhist û ne ji şikîlê Wi ditiye. 38 Kelama Wi dî hundurê we de nasekîne. Çimki hun iman bî yê ku Wi şandîye, nakîn. 39 Hun Nîvisêن bîmbarek dixwinin. Çimki hun zan dîkin ku jiyana we ya abedin dî wanda ye. Yên ku bo mîn şehadetiyyê dîkin ji ewin, (nîvisêن bîmbarekin!) 40 Disa ji bo ku hun bigihêن jiyana abedin, naxwazîn ku werin cem mîn.

41 „Ez meth kırına insanan qebûl nakîm. 42 Feqet ez we dizanîm, hundurê we de, (yanê dîlê we de) hezkırına Xudê tune. 43 Ez bî navê Bavê xwe hatim, feqet hun mîn qebûl nakîn. Eger ku yeki dîn bî navê xwe were, hunê wi qebûl bikin. 44 Hun meth kırınê ji hevûdu qebûl dîkin, feqet lî izeta ku ji Xudê'yê yek tê nagerin. Ma hun çawa dîkarîn iman bikin? 45 Zen nekin ku ez we ba Bav sûcdar dîkim. Yê we sûcdar dîke Müsa'ye, ewê ku we hêviya, (umêda) xwe bî wi

ve gîrêdaye. 46 Eger ku we iman bî Mûsa bîkîrana, we iman bî mîn ji bîkîrana. Çimki Mûsa derbarê Mîn de nîvisiye. 47 Feqet dema ku hun iman bî nîvisên Mûsa nekin, ma hun çawa iman bî gotinê mîn bîkin?“

İsa pênc hezar kesi têr dîke

(Met 14:13-21, Mer. 6:30-44, Lûq. 9:10-17)

6 Dû van tiştan re İsa, derbazê aliyê gola Celilê – yanê Taberiyê bû. 2 Qere-balîxek mezîn lî dû Wi dîçûn. Çimki wan mûcizeyên ku İsa bo nexwaşan çêdîkir ditübûn. 3 İsa derket çiyê û tev şagirtên xwe lî wê derê rûnişt. 4 Cejna Yahûdiyan ya derbazbûnê ji nêzik bû.

5 İsa dema ku serê xwe rakır û dit qere-balîxek insanın ya mezîn pey wi têن, Wi ji şagirtê xwe Filipûs re got, „Em ji kû derê nan binin ku em van têr bîkin?“ 6 İsa bo cerîbandına wi ev got, lê İsa bî xwe dîzaniya ku wê çi bîkîra.

7 Filipûs ji İsa re wîsa got: „Eger ku her yek ji wan hîndîk ji bîxwe em bî du sed dinari nan bigirin disa ji nake der.“

8-9 Şagırtêk yê Wi, bîrayê Simon Petrûs Andrêya, İsa re got ku: „Lî vîr bî zarok kê re pênc nanê cehini û du masi hene. Ema bo va qas mirovan çı ne?“

10 İsa got, „xelkê lî ser erdê bîdîn rûniştin ê.“

Lî wê derê ji pîr hêşinayı hebû. Bî vi awayi xelk hemû lî ser erdê rûnişt. Lî wê derê nêziki pênc hezar mîr hebûn. **11** İsa nan girt, şıkır kır û dû re yên ku rûniştibûn çıqas xwestin wi belav kır. Wi masi ji wîsa belav kır. **12** Dema ku herkes têr bû İsa ji şagırtên xwe re got, „Nanê ku zêde, (yanê ber maye) top bikin, wîsa ku qet tiştek ziyan nebe.“

13 Wan ew top kırın, bî wan bermayên wanên ku pênc nanên cehini xwarîbûn, bî wan qetikan dîwazdeh sepet tiji kırın.

14 Dema ku xelkê mûciza ku İsa çêkir dit, wîsa gotin: „Bî rasti ew Peyxamberê ku were dînê Ev e.“

15 Bona ku İsa zaniya ew xelk wi bîbîn û bî zor bikin şah, tenê çû çiyê.

İsa lı ser avê re dîmeşe

(Met.14:22-33, Mer 6:45-52)

16 Dema ku êvar bû şagirtên İsa daketin ba golê. **17** Lı wê derê lı qayixê siwar bûn û hêla Kefernahumê re bı rê ketin; ew aliyê din bû. Tari ketibû ser erdê û İsa ji hê ne-hatibû cem wan. **18** Dema ku bayek bîhêz hat gol rabû. **19** Dema şagirtên İsa rê ya sê milan bêrik kişandın, wan dit ku İsa lı ser avê re dîmeşe nêzikê qayixê bû, ber bı wan tê û ew tırsıyan. **20** Ema İsa ji wan re got, „Ez im, netırsın!“ **21** Bı vi awayi wan xwest ku İsa bigırın qayixê. Wê gavê qayix gehişt şûna ku ew dîcûn ê.

22 Dortıra rojê, ew kesê ku aliyê din sekini bûn, wan ditin ku ber golê tenê qayixek hebû û İsa ji tev şagirtên xwe lı wê qayixê siwar nebûbûn û şagirtên wi tenê lı qayixê siwar bûbûn. **23** Şûna ku Xudan şikir kır û dû re xelqê nan xwar, nêzikê wê derê lı Taberiyê qayixê din ji hatin. **24** Dema ku xelkê dit İsa û şagirtên wi lı wê derê ninin ew lı qayixan siwar bûn û aliyê Kefernahumê re çûn û lı İsa gerin. **25** Dema ku wan

İsa wi aliyê golê ditin, jê pırs kırın û gotin,
„Xudan, tu kengê hati vire?“

Nanê jiyanê

26 Isa wisa got: „We re bı rasti bı rasti
dibêjım, bona ku we mûcize dit nine, bona
ku we nan têr xwar bo wê yekê hun mîn
digerin. **27** Bona xwarına demi nine, bo
xwarına ku jiyana abedin de dîmine bo wê
xebatê bikin. Vina Lawê insan dide we.
(Yanê Isa got, Ez bîdîm we.) Çimki Bav Xu-
dê ev selahiyet daye wi.“

28 Xelkê ji ev jê pırs kır: „Bona ku em xe-
bata Xudê bikin, lazime ku em çi bikin?“

29 Isa, jı wan re wisa got, „Xebata Xudê
ewe ku, hun iman bı wi mîrovi binin yê ku
Xudê şandiye.“

30 Jı bo vê yekê xelkê jı Isa re wisa got, „
Tu mûcizeke çawa çêbiki bona ku em
bîbinin û iman bı te binên?“ **31** „Kalîkên
me lı çolê de man xwarın. Mina ku hatiye
nívisin, bona xwarına wan, jorde (yanê ez-
man de) Xudê nan da wan.“

32 Isa jı wan re wisa got, „Jı We re bı rasti

bı rasti dîbêjîm, jî jorde Mûsa (peyxamber) nan neda we, lî jorde nanê heqiqet, Bavê mîn dîde we. 33 Çîmki nanê Xudê, yê ku jorde hatiye jêr û heyatê (yanê jiyanê) dîde dînê Ev e.“

34 Xelkê ji wi re got, „Efendi, vi nani herdem bîde me!“

35 İsa got, „Nanê jiyanê Ez im. Yê ku were cem mîn qet bîrcî nabe, yê ku imanê bî mîn bine qet ti nabe.“ 36 Ema mîn jî we re got ku, we ez ditim, hun disa ji iman na-kîn. 37 Yênu ku Bav dane mîn, ew hemû wê werin cem mîn û yênu ku werin cem mîn ez wan qet der nakîm. 38 Çîmki ez ne lî dax-waza xwe dîgerim, lê jî bona ku xwestîna yê ku ez şandîme binim şunê jî jorde hatîm jêr. 39 Xwestîna Yê ku ez şandîme ev e: yênu ku wi dane mîn qet kesi winda nekim, Feqet roja paşiyê de wan hemûyan jî nûve rakîm. 40 Çîmki xwestîna Bavê mîn ev e ku, hemû kesê ku Law ditîne û iman bî Wi kırine bigihêن jiyana abedin. Ez ji wan roja dawiyê de jî nûve rabikim.

41 Bona ku İsa got, „Nanê ku jorde hatiye jêr Ez im.“ Yahûdiyan dijê wi, (yanê hem-

ber Isa) gotegot kırın. **42** Wan got, „ma ev Lawê Ûsîv Isa nine?“ Em dayêka wi û Bavê wi ji nas dıkın. Nîha çawa dibe ku, ew dibêje ku ez ji jor hatime jêr?“

43 Isa got, „nav xwe de gotegot nekin.“

44 „Eger Bavê ku ez şandime, kesekê nekîşine cem mîn, ew kes nikare were cem mîn. Yê ku were cem mîn ji ez wi roja dawiyê de ji nûve rabikim. **45** Mina ku pey-xamberan ji nîvisandîne, Xudê wan hemûyan re rê ya Xwe bide hu kırın! Herkesê ku dengê Bav dibihizin û ji wi hu dıkın ew werin cem mîn. **46** Mana vê ne ew e ku keseki Bav ditiye. Tenê yê ku ji Xudê ye Wi Bav, (yanê Xudê) ditiye. **47** Jı we re bî rasti bî rasti dibêjîm ku, ki iman bî wi bine jiyana wi ya abedin heye. **48** Nanê jiyanê Ez im. **49** Kalîkên we çolê de man xwarin, lê disa ji mirin. **50** Nanê ku jorde hatiye xwar heye, yê ku wi nani bîxwîn namirin. **51** Nanê ku jorde hatiye xwar, nanê sax (can) Ez im. Eger kesek ji vi nani bîxwe, abediyen dijin. Nanê ku ez bo oxira heyata dînê dîdîm ji, Bedena mîn e.“

52 Ser vê yekê Yahûdiyan got, „ev mîrov

bo xwarına me çawa dıkare ku bedena xwe bide me?“ wisa bı hevûdu re koşin kırın.

53 İsa ji wan re wisa got: „We re bı rasti bı rasti dıbêjim, heta ku hun bedena Lawê insan, (yanê bedena mın) nexwîn û xwina mın ji venexwîn, we de jiyan nabe. **54** Kesê ku bedena mın dıxwe û xwina mın vedix-we heyata wan ya abedin heye û Ezê wan roja dawiyê de nûve rakım. **55** Çimki bedena mın xwarına heqiqi û xwina mın ji vexwarına heqiqi ye. **56** Yê ku bedena mın bıxwe û xwina mın vexwe bı mın re dise-kîne û ez ji bı wi re. **57** Bavê ku diji mina ku ez şandım û ez bı Wi dijim, wisa yê ku bedena mın bıxwe ji wê bı mın bîji. **58** Ew nanê ku jorde hatiye xwar ev e; (yanê Ez im). Ne mina ku kalikên we xwariye û ew mirin. Yê ku vi nani bıxwe abed û abed diji.“ **59** Çaxê lı Kefernahumê de ders dıda, dı ibadetxanê ev tiştên ha gotin.

Pir kes İsa terk dile

60 Dema ku gelek şagirtên İsa ev gotinê

Wi bihistin, gotin ku, „ev gotina ha girane, ma ki dikare ku guhdari bîke?“

61 Dema İsa fehm kır ku şagirt bo vêna gotegot dikin, got, „Ma ev we dide şaş kırın?“ **62** „Eger ku lawê insan bîlindê me-qamê xwe, şûna ku Ew berê lı wê bû û hun ji vina bîbinin...? **63** Yê ku jiyanê dide Rîh'e. feyda bedenê tune. Ew sozên ku mîn jî we re gotin, ew Rîh û jiyan in. **64** Disa jî lı nav we de yên ku iman nakın hene.“ İsa yên ku iman nedikirin û yê ku wê ew bîda dest destpêkê de nas dikir û zani ku ew ki ye. **65** İsa wan re got, „Sebeba gotina ku mîn jî we re got, dema ku 'Bav keseki nekişine cem mîn kesek nikare were cem mîn, ev e.“

66 Ser vê yekê gelek jî şagirtên İsa şûva vegerin û êdi lı tev İsa nedigeriyan. **67** Wê çaxê, İsa jî diwazdehan pîrs kır û got, „Ma hun jî dixwazin herin?“

68 Simon Petrûs jî İsa re wîsa got: „Ya Xudan, ma em herine ba ki? Gotinêni jiyana abedin bî te re ne. **69** Em iman dikin û zanîn ku tu bimbarekê Xudê yi.“

70 İsa jî wan re wîsa got: „Yê ku hun diwaz-

deh helbijartın, ma ne Ez im? Disa ji lı nav we de yek iblis e.“ 71 İsa ev bona lawê Simon Yahudayê Isqaryoti got. Çimki Yahuda yek ji dıwazdeh şagırtên İsa bû û yê ku İsa bıdaba dest ew bû.“ (Yanê wi İsa êxbar kır).

İsa tere Qudsa (Şerif)

7 Pıştı vê yekê İsa lı Celilê de digeriya. Bona ku Yahûdiyan xwastın ku wi bikujin, wi nexweste ku bajarê Yayûdiyê de bigere. 2 Cejna Yahûdiyan ya çardax çêkrinê nêzik bû. 3 Bı vi awayi bırayên İsa ji wi re gotin, „Jı vê derê derkeve û here bajarê Yahûdiyê“ ku, „şagırtên te ji tiştên ku tu çêdiki bıbinin. 4 Çimki ew kesê ku dixwaze xwe bı eşkereyi bide nas kırınê, tiştê ku çêdike venâşêre. Madem ku tu van tiştan çêdiki, xwe şani, (nişanê) dînê bide!“ 5 Heta bırayên Wi ji iman bı Wi nedikirin.

6 İsa ji wan re got, „Wextê mîn hê nehatiye,“ feqet „bo we wext her dem munasib e. 7 Dînê nîkare ji we nefret bîke, feqet ji mîn nefret dîke. Çimki ez derbarê dînê de şehadetiyê dîkim ku karên wê xırabın.

8 Hun herin vê cejnê. Ez nîha naçım. Çimki wexta mîn hê temam nebûye.“

9 Pışti ji wan re ev tiştên ha got, bajarê Celilê de ma. **10** Feqet dema ku bîrayêñ Wi çûn cejnê, ew bî xwe ji çû. Ema Ew ne bî eşkereyi, lê bî dîzi çû. **11** Yahûdi ji wê sîrê de lî Wi geriyan, pîrs kîrîn û gotin, „Ew lî kû derêye?“

12 Nav qerebalixê de derbarê Isa de pîr tişt dîhat qisekirin. „Pîr kesan dîgot, Ew mîrovek rînd e, hînêñ dîn ji dîgot na Ew xelkê dîxapine û ji rî derdixîne.“

13 Disa ji ji ber ku xelk ji Yahûdi'yan ditîrsin, kesi nedîkariya ku derbarê Isa de eşkêre tiştekê bîbêje.

14 Nivê idê derbaz bû. Isa ji çu İbadetxanê, dest pê kîr û ders da xelkê. **15** Yahûdi şaş man. Wan dîgot ku, „Vi mîrovi qet nexwendîye, ma Ew çawa dikare ku wîsa ilîmdar bîbe?“

16 Isa ji wan re wîsa got: „Dersa ku ez dîdim we ew ya mîn nine, ew ders ya wi ye yê ku ez şandime.“ **17** „Eger kesek dîxwaze xwestîna Xudê bîne şunê, ew zane ku ev ilm, ilmê Xudê ye û ne yê mîn e. **18** Yêñ ku

behsa xwe dıkın xwazin xwe bîlind bîkîn, feqet yê ku dixwaze Xudê bîlind û bîmbarek bîke ew raste û lî Wi de qet neheqi tune. 19 Ma Mûsa (peyxamber) qanûn, (yanê şeriat) neda we? Disa ji qet kesek lî nav we de emîrê şeriatê neanîn şunê. Çîma hun dixwazîn ku mîn bîkujîn?“

20 Wê çaxê temamê qerebalîxê ji Isa re got: „Tu cîndar bûyi!“ „Ki dixwaze ku te bîkuje?“

21 Isa ji wan re wîsa got: „Mîn xebatek çêkîr hun hemû şaş dîbin.“ 22 „Bona ku Mûsa bo sunet bûnê ferman, (emîr) da we-eslînde ew emîr ne ji Mûsa ye, ew ji kalîkên we maye-roja Septê hun mîrovekê sunet dîkîn. 23 Bona ku şeriata Mûsa xîrab nebe, mîrovek roja Septê tê sunet kîrin û, bona ku mîn dî roja Septê de mîrovek tamamen sax kîr, ma çîma hun ji mîn re bî hêrs dîkevin? 24 Mîna ditîna çavan hukum nekîn, bî rasti hukum bîkîn.“

Ma Isa, Mesîh e?

25 Hînek ji xelkê Qudsa şerif ji bo vê yekê

gotin: „Ma yê ku lı kuştına wi digeriyan, ne ev e?“ **26** „Mêze, Ew nıha eşkereyi qise dike û qet kesek ji wi re tiştekê nabêje. Ecêba serdaran bı rasti fehm kırine ku ew Mesih e? **27** Feqet em dizanın ku ev mirov ji kû derêye. Lê belê dema Mesih were, kes nızane ku ew ji kûderê hatiye.“

28 Wê demê Isa ibadetxanê de ders dida û Wi dengê xwe bılınd kır û wisa got: „Hun hem min nas dıkın û hem ji zanin ku Ez ji kûderê me! Ez bı xwe nehatim. Yê ku Ez şandime rast e, (heqiqet e). Hun Wi nas nakın. **29** Ez Wi nas dıkım. Çimki Ez bı Wi re me û Wi ez şandım e.“

30 Ser vê yekê Yahûdiyan xwestin ku Isa bigirin, feqet qet keseki destê xwe nedan ser wi. Çimki saeta Wi hê nehatibû. **31** Jı xelkê ji pır kesan iman bı Wi anin. Wan digot: „Dema ku Mesih were, ma jı vi Isa zê-detir û mezintir mûcizan dıkare ku çebike?“ **32** Fêrisiyan ji bihistin ku xelk derbarê, Isa de van tiştan qise dıkın. Serokê Kahinan û Fêrisiyan jı bo gırtına Isa mirov şandın.

33 Isa wisa got: „Ez hê midetek kurt bı we re me,“ „dû re disa dicim cem yê ku Ez

şandım e. 34 Hunê lı mın bîgerin, feqet hun
mın nabinin. Ü şunda ku Ez hazırlım hun
nîkarın werin wê derê.“

35 Lı ser vê yekê Yahûdiyan hevûdu re
gotin: „Gelo ev mirov wê kû ve here ku em
nîkarın Wi doz bikin?“ „Ma Ewê here nav
Yûnaniyan, cem yên ku lı nav wan de bela
bûne, dersê dide wan? 36 Ew dibêje ku,
hunê lı mın bîgerin, feqet hun mın nabinin
ü şuna ku Ez hazırlım hun nîkarın werin wê
derê. Ma Ew dixwaze çi bîbêje?“

37 Roja idê ya dawiyê de û en roja mîhim
de, İsa rabû ser piyan dengê xwe bîlind kîr
û wîsa got: „Eger ku kesek ti bûye bîla
were ba mîn û avê vexwe. 38 Mina ku
nîvisên bîmbarek ji dibêjin, yên ku imanê
bî mîn binin lı hundurê wan de robarê avê
yê jindar dîherike.“

39 Lê belê İsa ev derbarê wi Rîh'i de got
yên ku imanê bî Wi binin, bigirin. Jî ber ku
Rîh hê nehatîbû dayin. Çimki İsa hê bîlind
nebû. 40 Dema ku jî xelkê hîn kesan ev
gotinêñ ha bihistin, hînekan got, „bî rasti
Ev Ew Peyxamber e.“

41 Hîn kesan jî got, „Ev Mesih e.“

Hın kesan ji got, „ç! Ma Mesih wê ji Celilê bê?“ **42** Ma kîtêbê negotiye Mesih wê ji zuriyeta Davud (peyxamber) û gundê Davud Betlêhmê de were?“

43 Wîsa nav xelkê de ji sebebê İsa firqat çêbû. **44** Hın kesan xwestin İsa bigirin, feqet kesi destê xwe nedan Wi.

İmansıztiya serokên xelkê Yahûdi

45 Dema ew kesên ku Fêrîsiyan û serokên Yahûdiyan bona girtina İsa şandibûn, ew suve vegeriyan, serokan û Fêrîsiyan ji wan pîrs kîrin û gotin: „We çıma Ew neani?“

46 Wan ji wîsa got: „Qet tu caran kesekê mina ku İsa qise dîke, qise nekiriye.“

47 Fêrîsiyan wan re gotin: „Ma hun ji hatin xapandin? Serok, êxtiyar û Fêrîsi, ma qet kesekê iman bî İsa ani ye? Lê belê ev xelkênu ku Şeriatê nîzanın ew lanetline.“

50-51 Lı nav wan de mirovek, yê ku navê wi Nikodim bû û berê bî şev hatîbû ba İsa, wi ji wan re wîsa got: „Ma lı gora Şerîta me heta mirovekê guhdari neke û tîştê ku ew dîke ji hu nebe, derbarê wi de hukum

bide, rast e?“ 52 Jı wi re gotin, „ma tu ji
ji bajarê Celilê yi?“ „Lê bigere û mîzeke,
ji bajarê Celilê peyxamber dernakeve.“
53 Piştre herkes çû mala xwe.

Jînîk, yanê, pireka ku zina kiriye

8 Isa çû çiyayê zeytûnê. 2 Roja dîn, (yanê
dortıra sibê) zû disa vege riya ibadet-
xanê. Temamê xelkê hatin cem wi. Ew ji
rûnişt dest pê kîr û ders da wan. 3-4 Miro-
vîn dindar û yên Fêrisi, jînikek dema ku
zina dikir girtibûn û wan ew jînîk anin cem
Isa. Wan jînîk derxist meydanê û Isa re go-
tin „Mamoste vê jînîkê dema ku zina dikir
hat girtin.“ 5 „Mûsa (peyxamber) şeriatê de
emîr daye me ku yên wîsa werin kevir
kîrinê, tu bi tê çi bêji?“ 6 Wan bo cerêban-
dînê eva ha gotin da Isa suçdar derxin.

Lê belê Isa xar bû, bî tiliya xwe, lî ser erdê
nîvisandin dînîvisand. 7 Jı ber ku wan dî
pirs kîrinê de berdewam kîrin, lî ser vê
yekê Wi xwe rast kîr û jî wan re got: „Jî we
yê bê suç ki ye bîla ew kevirê pêsi bavêje
ser wê jînîk ê!“

8 Isa disa xar bû û dest bi nîvisinê kîr.
9 Dema ku wan ev bîhistin, dest pê kîrin ji
yên êxtiyar û heta yê paşiyê yek bi yek
bazdan çûn û Isa tenê cih hîstîn. Jînîk ji
wê meydanê de sekini bû. **10** Isa xwe rast
kîr û jînîkê re got: „Jînîkê kanêñ ew? Ma
qet kesekê tu hukum nekiri?“

11 Jînkê got: „Na ya Xudan, tu kesi ez
hukum nekirim.“

Isa got: „Ez ji te hukum nakim.“ „Here û
êdi ji vir şûnde guneh neke!“

Şehadetiya ku derbaz dîbe, yanê tê qebûl kîrin ê

12 Isa disa dengê Xwe bîlînd kîr û ji xelkê
re got: „Ez ronahiya dînê me. Kesê ku lî
dû mîn werin, ew lî tariyê de nameşin û
dîbin xwediyyê ronahiya jiyanê.“

13 Fêrisiyan got: „Tu ji bo xwe şahadetiyyê
dîki, şehadetiya te rast nine.“

14 Isa ji wan re got: „Eger ku ez bo xwe
şehadetiyyê bîkim ji, disa şehadetiya mîn
rast e. Çimki ez zanîm ku, ez ji kû hatîm û
dîçim kû derê. Feqet hun nîzanîn ku ez ji

kû hatım û bı kû ve dîçim. 15 Hun lı gora bedenê hukum dîkîn. Ez hukum lı kesi nakîm. 16 Feqet Ez hukum bîkim ji, hukmê mîn rast e. Çîmki Ez ne tenê me, ez û Bavê ku ez şandîme bî hev re ne. 17 Şeriatâ we ji dîbêje ku şehadetiya du kesan rast e. 18 Yê ku bo mîn şehadetiyê dîke ez im. Ü Bavê ku ez şandîme, Ew ji ji bo mîn şehadetiyê dîke.

19 Wê çaxê wan ji İsa pîrs kîr û got: „Bavê te lı kû ye?“ İsa ji wan re got: „Hun ne mîn nas dîkîn û ne ji Bavê mîn. Eger we ez nas bîkirîma, we wê Bavê mîn ji nas bîkirana.“ 20 İsa çaxê ev gotinêñ ha gotin ibadetxanê de dema ku ders da, şunda ku pere top dîkîrin lı wê derê de got. Kesi ew negirt. Çîmki saeta wi hê nehatîbû.

21 İsa ji wan re disa got: „Ez terim. Hunê lı mîn bigerin û lı nav gunehêñ xwe de bîmirin. Şuna ku Ez terim hun nîkarin werin wê derê.“

22 Yahûdiyan got: „Ecêba ew wê xwe bîkuje?“ „Çîmki ew dîbêje ku şuna ku ez terim hun nîkarin werin wê derê.“

23 İsa ji wan re got: „Hun ji jêrin, ez ji

jorım.“ „Hun jı vê dînê ne, ez ne jı vê dînê me. 24 Va ye jı bo vê yekê mîn jı we re got, „Hunê lı nav gunehêن xwe de bîmirin.“ Eger hun iman nekin ku, ez Ew im, hunê lı nav gunehêن xwe de bîmirin.“

25 Wan jı İsa pîrs kır û gotin, „Tu ki yi?“ İsa, „Ez tam Ew zatîm yê ku mîn dî dest-pêkê de jı we re got.“ 26 „Lı derbarê we de hê pîr gotin û pîr tîştê mîn yêن ku hukum lı we bikin hene. Lê belê Yê ku ez şandîme heqiqet e. Ez jı Wi çî bîbihizim jı dînê re wê dîbêjim.“

27 Wan fehm nekir ku İsa jı wan re derbarê Bav de qise kır. 28 Jı bo vê yekê İsa wîsa got: „Dema ku we Lawê insan, bîlindê jor kır, wê çaxê hunê fehm bikin ku ez Ew im û ez bî xwe qet tîştekê nakîm, feqet Bav çawa mîn re bêje, ez ji wîsa dîbêjim. 29 Yê ku ez şandîme lı tev mîn e, Wi ez tenê ne-hıştim. Çîmki ez her dem tîştê ku Wi, (yanê Xudê) xoşnûd dîkin, çêdikim.“ 30 Dema ku Wi wîsa qise kır, pîr kesan iman bî Wi ani.

Zarokên İbrahim xelil û zarokên İblis

31-32 İsa wan Yahûdiyên ku iman bî wi kırıbûn, jî wan re got: „Eger ku hun gotinêñ mîn de bisekinin, wê çaxê hun bî rasti şagirtê mîn ìn. Hunê rastiyê bîzanin û rasti ji wê we azad bîke.“

33 Yahûdiyan jî İsa re wîsa got: „Em zuryeta İbrahim xelil ìn“. Me, „tu caran jî kesire koleti nekîriye“. Tu çawa jî me re dîbêji ku: „Hunê werin azad kîrin?“

34 İsa jî wan re got: „Ez jî we re bî rasti bî rasti dîbêjîm, hemû kesê ku guneh dîkin ew koleyê gunehin.“ **35** „Kole lî malde abedin namine, feqet Law herdem dîmine.

36 Bo vê yekê, eger ku Law we azad bîke, hun bî rasti azad ìn. **37** Ez dizanım ku hun zuryeta İbrahim xelil ìn. Lê belê hun dixwazin ku mîn bikujin. Çimki hun dî dîlê xwe de cih nadîn gotinêñ mîn. **38** Ez jî tiştê ku ba Bavê xwe dîbinim dîbêjîm, hun jî tiştê ku jî Bavê xwe bîhizin dîkin.“

39 Wan jî İsa re wîsa got: „Bavê me İbrahim xelil e.“

İsa jî jî wan re wîsa got: „Eger ku hun zaro-

kên İbrahim xelil bûna, we wê karêن İbrahim xelil bikirana.“ **40** „Feqet hun nîha dixwazin ku mîn, yê ku ji Xudê rasti bîhistiye û ji we re gotiye, bîkujin. İbrahim xelil ev tıştên ha nekîr. **41** Hun karên bavê we dikin.“ Wan ji İsa re got: „Em ji zinayê newelîdin. Tek Bavekê me heye, Ew ji Xudê ye.“

42 İsa ji wan re got: „Eger ku Xudê Bavê we bûya, we ji Ez hez bikirama.“ Çimki ez ji Xudê derketim û hatim. Ez bî xwe nehatim, Xudê ez şandım. **43** Çîma hun va gotinê ku ez ji we re dibêjîm, fehm nakîn? Ji ber ku Hun gotinêñ mîn guhdari nakîn. **44** Hun ji Bavê xwe iblisin û hun dixwazin ku xwestîna bavê xwe bikin. Ew destpêkê de qetil bû. Ew lî rastiyê de nesekini. Çimki lî wi de rasti tune. Dema ku ew derew dîke, ji ya xwe dibêje. Çimki ew derewçiye û bavê derewan e. **45** Feqet bona ku ez rasti yê dibêjîm, hun iman bî mîn nakîn. **46** Lî nav we de ki dikare hebûna guneh dî mîn de bîde ispat kîrin? Eger ku ez ji we re rastiyê dibêjîm, hun çîma iman bî mîn nakîn? **47** Yê ku ji Xudê ne, ew guh didin gotinêñ Xudê. Ji bo wê

yekê hun guh nadînê, çîmki hun ne jî Xudê ne.

Mezintiriya Isa

48 Yahûdiyan jî Isa re wîsa got: „Me jî te re got, tu jî Semiriyê yi û dî te de cîn heye, ma gotîna me ne rast e?“ **49** Isa got: „Mîn de cîn tune; lê belê ez Bavê Xwe re hurmetê dîkîm û hun ji mîn nîzm dîkin. **50** Feqet ez lî izeta xwe nagerim; yeki ku digere û hukum dîke heye. **51** Jî we re bî rasti bî rasti dîbêjîm, eger insanek gotîna mîn bîgire ew abedin mîrinê nabine.“

52 Yahûdiyan jî Isa re got: „Me nîha fehm kîr ku, dî te de cînek heye.“ İbrahim xelil mîr, peyxamber ji mîrin. Û tu dîbêjî: „Eger kesek gotîna mîn bîgire, abedin mîrinê tam nake. **53** Yan tu jî bavê me İbrahim xelil mastır i? Ew mîr, peyxamber ji mîrin; ma tu xwe ki zen dîki?“

54 Isa wîsa got: „Eger ku ez xwe bîlînd bîkîm, izeta mîn ne tişteke. Yê ku mîn bîlînd dîke Bavê mîn e; hun dîbêjin ku: ,Ew Xudê yê' me ye **55** û hun Wi nas nakîn.

Feqet ez Wi nas dıkım; û eger ez bêjîm ku ez Wi nas nakım, wê çaxê ez ji mina we dibim derewin; feqet ez Wi nas dıkım û gotına wi qebûl dıkım. 56 Bavê we İbrahim xelil bona ku ew roja mîn bîbîne bî şabûniyê coşin kîr. Wi dit û dîlgeş bû.“

57 Bo vê yekê Yahûdiyan jî İsa re got: „Tu hê pênce sali nini. Ma te İbrahim xelil ji dit?“

58 İsa wan re got: „Ez jî we re bî rasti bî rasti dibêjîm, jîberi ku İbrahim xelil hebe ez heme.“

59 Wê çaxê bona ku İsa kevîr bikin wan jî erdê kevîr girtin, feqet İsa xwe veşart û ibadetxanê der ket.

İsa çavê mîrovekê kor vedike

9 Dema ku İsa derbaz dibû, mîrovekê ku jî dayika xwe kor hatîbû dînê dit.

2 Şagirtên İsa jî wi pîrs kîrin û gotin: „Xudan, jî bo ku ev kor welîdiye ki guneh kîriye, vi an dayik û bavê wi guneh kîrin e?“

3 İsa jî wan re wîsa got: „Ne wi, ne ji dayik û bavê wi guneh kîrin. Encax bona ku

karêن Xudê lı ser wi xuya bikin ew çêbûye.

4 Karêن Yê ku ez şandime, hê roj gereke em bikin; şev tê, wê çaxê tu kes nikare kar bîke. 5 Heta ku ez dînê de me, ez ronahiya dînê me.“

6 Pışti van tiştan tûyê erdê kır, pê xaziya xwe çamûr çekir û ew çamûr lı çavê wi da.

7 İsa jı wi re got: „Here, hewza Şiloam de xwe bîsu.“ Tercuma Şiloamê hatîye şan-dîn e.

Ew mîrov ji çû xwe şuşt û çavê wi vebû û wîsa şunde hat. 8 Wê demê cinarê wi û ew kesên ku dizanin ew berê parsek bû, wîsa gotin: „Ev mîrov yê ku rûdınışt û pars dikir, ma ev ne ew e?“

9 Hînan got: „Erê ew e“ û hînên dîn ji got: „Na, ew nine lê mina wi ye.“

Wi bî xwe got: „Ez ew im.“

10 Wê çaxê wan jê pîrs kır û gotin: „Ma çavê te çawa vebûn?“ 11 Wi ji jî wan re wîsa got: „Ew mîrovê ku navê wi İsa ye, wi çamûr çekir û çavê min re da û got: „here hewza Şiloamê de xwe bîsu. Ez ji çûm lı wê min xwe şuşt û çavê min vebûn.“ 12 Wan ji wi pîrs kîrin: „Ew lı kû ye?“ Wi ji got, „nîzanîm.“

Pırsiyarı kırına Fêrîsiyan

13 Ew mirovê ku berê kor bû, bîrin cem Fêrîsiyan. **14** Roja ku İsa çamûr çekiribû û çavê wi re dabû, ew roj roja sebtê bû. **15** Bo vê yekê Fêrîsiyan disa jî wi mirovi pırs kırın û gotin, çavê te çawa vebûn? Wi jî got: „İsa çamûr çavê min re da, min xwe suşt û dit.“

16 Jî ber vê yekê jî Fêrîsiyan hîn kesan wîsa got: „Ev mirov ne jî xudê ye.“ „Çimki ew şertê roja sebtê naine şunê.“

Feqet hînên dîn jî got: „Miroveki gunehkar çawa dikare ku mûcize yê mina vê mûcizê çêbîke?“

Wîsa navbera wan de firqat çêbû. **17** Wan disa jî wi mirovê ku berê kor bû pırs kır: „Tu jî bo wi mirovê ku çavê te ve kır, çi dibêji?“

Wi mirovi got: „Ew peyxamber e.“

18 Yahûdi, heta ku gazi dayik û Bavê wi mirovê ku berê kor bû nekîrin, bawer nekîrin ku ew berê kor bû û nîha çavêni wi vebûn e. **19** Wan jî dayêk û bavê wi pırs kır û gotin: „Lawê we yê ku hun dibêjin kor

hate dînê ev e? Başe, ma nîha ew çawa dîbîne?”

20 Dayêk û bavê wi mîrovi jî wan re wîsa gotin: „Em zanîn ku ev lawê me ye û em vîna ji dizanîn ku ew dema ku jî dayêka xwe bû kor bû. **21** Feqet em nîzanîn ku ew nîha çawa dîbîne, ki çavê wi vekirîne em nîzanîn, jê pîrs bikin. Ew mezîn e, jî bo xwe bîla ew qîse bîke.“ **22** Ew jî Yahûdiyan tîrsin, bo wê yekê wan wîsa qîse kîr. Çimki Yahûdiyan dî nav xwe de qerar girtibûn ku, ki eşkereyi bîbêje ew Mesih e, ew wan jî ibadetxanê bikin der. **23** Bo wê yekê dayêk û bavê wi mîrovi gotin: „Ew mezîn e, jî wi pîrs bikin.“

24 Wan disa bang wi mîrovê ku berê kor bû kîr û jî wi re gotin: „Jî Xudê re şikir bîke!“ „Em zanîn ku ev mîrove gunehkar e.“

25 Wi mîrovi ji jî wan re wîsa got: „Ew gunehkar e yan gunehkar nine, ez nîzanim. Feqet tiştê ku ez zanim ev e, ez korbûm û nîha ji dîbinim.“

26 Wê çaxê jî wi re gotin: „Wi jî te re çî kîr? Wi çavê te çawa vekir?“

27 Wi jî wan re got: „Mîn nîha jî we re got,

feqet we guhdari nekîr.“ „Çîma hun dixwazîn disa bîbihizîn? Yan hun ji dixwazîn bîbîn şagirtên Wi?“

28 Wan ji wi mîrovi re kîfr kîr û gotin: „Tu şagirtê Wi yi!“ Wan got: „Em şagirtê Mûsa ne. 29 Em zanîn ku Xudê ji Mûsa re gotiye. Feqet em nîzanîn ku ev mîrov ji kû ve hatiye.“

30 Mîrov ji wan re wîsa got: „Ev e tîşta ku insan dîde şas kîrînê! Hun nîzanîn ew ji kû ve hatiye, ema çavên mîn Wi vekir. 31 Em zanîn ku Xudê guh nadî kesen gunehkar. Eger ku kesek ji Xudê re ibadet dîke, û irada Wi bîke, Xudê guh dîde wi. 32 Tarixa dînê de hê kesi nebîhistiye ku, kesi çavê mîroveke ku kor hatiye dînê vekiriye. 33 Eger ku ev mîrov yê Xudê nebûya, wi nedîkari ku tîştekê, (mûcize kê) wîsa çêbîke.“

34 Jî wi re gotin: „Tu temam lî nav guneh de welidi, ma tu dersê dîdi me?“ Wîsa wan ew avêtin der.

Kor bûna rîhani

35 İsa bîhist ku wan ew mîrov avêtin der.

İsa ew mirov dit jê pırs kır û got: „Tu iman bı Lawê İnsan diki?“

36 Wi mirovi wısa got: „Efendi, Ew ki ye ku, ez bı Wi iman bıkım?“ 37 İsa jı wi re got: „Hem te Ew dit û hem ji yê ku nıha lı tev te qise dike Ew e.“ 38 Wi mirovi got: „Ey Xudan, ez iman dıkım! û wi jı İsa re secde kır.“ 39 İsa jı got: „Ez hatım ku, yêñ ku korın bıbinin û yêñ ku ne korın ji kor bıbin; ez bo hukum kırınê hatım dinê.“

40 Hın kesên Fêrîsi ji cem İsa bûn, wan dema ku ev gotinêñ İsa bıhistin, jı İsa pırs kırın: „Ma em ji korın?“ 41 İsa jı wan re wısa got: „Eger ku hun kor bûna gunehê we wê nebûya,“ „feqet nıha: „Hun dibêjin ku, ,em dibinin‘ bo vê yekê gunehêñ we dîsekînin.

Şıvanê rînd, (yê qenc)

10 „Bı rasti bı rasti jı we re dibêjim, yê ku deri re naçe hewşa miyan û rê kidın re ketiyê diz û eşqiya ye. 2 Feqet yê ku deri re tere hindur ji, ew şıvanê miyan e. 3 Dergevan wi re deri vedike, mi dengê

Şıvan dibihibizin; şıvan ji mi yê xwe bî navê wan bang dike û wan dibe der. 4 Dema ku wi mi yê xwe hemû derxistin der, ew lî pêşixa wan tere û mi ji lî dû wi terin. Çimki mih dengê wi nas dikin. 5 Ü lî dû yên xerib naçin û ji ber wan direvin. Çimki dengê xeriban nas nakin.“

6 İsa ji wan re ev temsile got, feqet wan disa ji xwestina İsa fehm nekîr.

7 Ser vê yekê İsa ji wan re disa got: „We re bî rasti bî rasti dibêjîm“, „ez deriyê miyanım. 8 Yên ku berê mîn hatin hemû diz û haydut bûn, feqet miyan guh nedan wan. 9 Ez deri me. Eger ku keseke dî mîn re here hindur, xîlas dibe. Tere hindur, dice der û çêregeh dibine. 10 Diz tenê bo diziyê, kuştinê û bo tune kırınê tê. Ez hatim ku insan bîbin xwedyî jîyanê, jiyana wan ya zêde hebe. 11 Ez şıvanê rîndim. Şıvanê rînd oxıra miyê xwe de canê xwe dide. 12 Ew mîrovê ku şıvan û xwedyî miyan nine yê ucretli, dema ku ew hatîna gur bîbine, miyan ber dide û direve, tere. Gur ji wan digre û belav dike. 13 Ew mîrov direve, çimki ew ucretliye û bona miyan xem nake. 14-15 Ez

şivanê rînd im. Ez yên xwe nas dîkim. Çawa Bav mîn nas dîke û ez ji Bav nas dîkim, yên mîn ji wîsa mîn nas dîkin. Ez bo miyê xwe canê xwe dîdîm. **16** Hê miyê mînê dîn ji hene ew daxîlê vê hewşê nin in. Ez gerek wan ji binim. Ew dengê mîn bîbihizîn û bîbin tek şivan û tek naxır. **17** Bona ku ez canê xwe dîdîm ku ez disa şuve bigirim. Bona vê yekê Bav ji mîn hez dîke. **18** Kes nîkare canê mîn ji mîn bigire; feqet ez wi bî xwe û xwe dîdîm. Bo dayina canê mîn û şuve girtına wi qudra ta mîn heye. Mîn ev ferman ji Bavê xwe girt.“ **19** Jî ber vê qise kırına İsa lî nav Yahûdiyan de disa firqat çêbû. **20** Lî nav wan de pîr kesi got: „Wi de cîn heye, ew din e; ma hun çıma wi guhdari dîkin?“ **21** Hînên dîn ji got: „Ev qisetê ha yên mîrovê cîndar ninin.“ „Cîn dikare ku çavê koran vebike?“

Bêimantiya Yahûdiyan

22 Wê sîrê de lî Qudsa şerif de bo biranina vebûna ibadetxanê id hebû. Mevsim ji

zivistan bû. **23** İsa hîndur ibadetxanê, li cem eyvana sileyman de dîgeriya. **24** Yahûdiyan dora wi girtin û ji wi re wîsa gotin: „Ma Tu heta kengê me li şikê de bîhêlini?“) „Eger ku Mesih tu yi, ji me re bi eşkereyi bîbêje.“

25 İsa ji wan re wîsa got: „Mîn ji we re got, feqet we iman nekîr. Ew xebatê ku mîn bî navê Bavê xwe kîrin, ew ji bo mîn şehade-tyê dîkin. **26** Feqet hun iman nakîn. Çimki hun ji daxîlê miyên mîn ninin. **27** Miyên mîn dengê mîn dibîhizin. Ez ji wan nas dîkim û ew ji li dû mîn tê. **28** Ez heyata, (jiyana) abedin dîdime wan û ew qet mehf nabin. Qet kesek nîkare ku wan ji destê mîn derxine. **29** Bavê mîn Yê ku ew dane mîn ji hemûyan mezîntir e. Quveta kesi nîkare wan ji dest Bav derxine. **30** Ez û Bav yek in.“

31 Yahûdiyan disa ji erdê kevir girtin û xwastin ku İsa bîdin kevir kîrin ê. **32** İsa ji wan re wîsa got: „Mîn gelek xebatê rînd yêni ji Bav nişan we dan.“ „Hun ji bo kijan xebatê, mîn kevir dîkin?“

33 Yahûdiyan ji İsa re wîsa got: „Em te bo

xebatê rînd nine, bona ku te kîfr kîr em te kevîr dîkîn. Tu ji insani, feqet tu dîbêji ku Ez Xudê me.“

34 İsa wîsa got: „Ma şeriata we de nehatiye nîvisinê? Ku Mîn got, ,hun ilahîn?“

35 Xudê, Kelama Xwe ki re şandiye, ji wan re ilah tê gotin û kîtêb xîrab nabe. 36 Bav ez bîmbarek kîrim û şandım dinê. Wê çaxê bona ku mîn got ez Lawê Xudê me, hun çawa mîn re dîbêjin ku te kîfr kîr? 37 Eger ku mîn xebata Bavê xwe nekîriye, iman bî mîn nekin. 38 Ema eger ku ez dîkim û hun nexwazin iman bî mîn bikin, balê imanê bî xebatê ku ez dîkim binin. Wîsa ku, hun bîzanin û fehm bikin ku Bav bî mîn re ye û ez ji bî Bav re me.“

39 Wan disa xweste ku İsa bigirin, feqet ew ji dest wan derket û çû.

40 İsa disa çû aliyê çemê Erdenê, şunda ku Yehya (peyxamber) berê vaftiz kîr û lî wê derê ma. 41 Pîr kes hatin cem İsa û gotin: „Gerçi Yehya (peyxamber) qet mücîze çênekir; feqet ew tiştê ku Yehya ji bo İsa got, ew hemû rast bûn.“ 42 Û lî vê derê pîr kesi iman bî İsa anin.

Mırına Lazar

11 Gundê Meryem û Xuşka wê Marta li Bêtanyê de mirovekê ku navê wi Lazar bû nexwaş bû. **2** Meryem, ew jînika ku rûnê bihn xwes li Xudan da bû û bî pora xwe ji lîngê Wi paqîj kîr ew bû. Ew mirovê ku nexwes bû, Lazar ji bîreyê Meryemê bû. **3** Her du xuşkan jî İsa re xeber şandin û gotin: „Ya Xudan, yê ku tu jê hez dîki nexwaş e.“

4 Dema ku İsa ew xeber bîhist wîsa got: „Ev nexwesi bo mîrinê nine, feqet ev jî bo bîlind bûna Lawê Xudê û izeta Xudê ye.“

5 İsa, hez jî Marta, xuşka wê Meryem û Bîreyê wan Lazar dîkir. **6** Ü dema ku İsa bîhist Lazar nexwaş e, li şunda xwe de hê du rojê dîn ma. **7** Dû re şagirtên xwe re got: „Em vejerin bajarê Yahûdiyê.“

8 Şagirtan jî Wi re got: „Xudan“, „Yahûdiyan gavek pêşde xwestin ku te kevir bikin. Ma tu disa dici wê derê?“

9 İsa jî wan re got: „Ma rojek dîwazdeh saet nine? Eger insan rojê bigere tilpeki

nabe. Çimki ronahiya vê dînê dîbîne. **10** Feqet insanê ku şev bîger e, ew tîlpeki dîbin. Çimki ronahi dî wi de tune.“ **11** İsa lî dû vê qise kîrînê re got: „Dostê me Lazar xew de çûye;“ „feqet ez terim ku wi hêşyar bîkim.“ **12** Şagirtên İsa gotin: Ya „Xudan“, „eger ew xew de çûye wê rînd bîbe.“ **13** İsa ev jî bo mîrina Lazar got, feqet şagirtên Wi fehm nekîrin. Wan zen kîr ku Wi bo xew de çûnê got. **14** Wê çaxê İsa jî wan re bî eşkerîyi got: „Lazar mîriye“. **15** „Bona ku hun iman bîkin, kîfa mîn tê ku ez ne lî wê derê bûm. Em nîha herin cem Lazar.“ **16** Şagirtêkê İsa yê ku jêre dîgotin, „Zo’ navê wi Tomas bû, wi jî wan şagirtên dîn re got: „Em ji jî bo mîrinê bî wi re herin!“

Şina Marta û Meryemê

17 Dema İsa hat, xeber girt ku Lazar çar roj e ku kîrine mezelê. **18** Bajarê Bêtanyê jî Qudsê nêzika panzdeh tir avêtinê dûr bû. **19** Pîr Yahûdi hatîbûn cem Marta û Meryemê bo mîrina bîrê wan dixwestin ku wan teseli bîkin. **20** Dema ku Marta hatîna İsa

bîhist derket der û berbî İsa ve çû, xuşka wê Meryem ji mal de rûdınışt.

21 Marta ji İsa re wîsa got: „Ya Xudan“ „eğer tu lı vîra bûna, bîreyê mîn nedîmir.
22 Ez nîha ji zanim ku, tu ji Xudê çî bîxwazi Ewê bîde Te.“

23 İsa got: „Bîreyê te radibe.“

24 Marta got: „Ez zanim roja dawiyê de, (yanê roja mehşerê) bîreyê mîn radibe.“

25 İsa ji wê re wîsa got: „Qiyamet û Heyat Ez im.“ „Yê ku imanê bî mîn bine, ew bîmire ji disa dîji. **26** Yê ku jin dîke û iman bî mîn dîke qet namîr e. Tu ji vîna re iman dîki?“

27 Marta got: „Erê ya Xudan.“ „Mîn iman ani ku Tu Lawê Xudê yê ku were dînê Mesih i.“ **28** Marta ev got û lı dû re bî dizika çû gazi xuşka xwe Meryemê kîr û got: „Mamoste lı vîraye û bang te dîke.“

29 Dema ku Meryemê ev bîhist, hema rabû û çû cem İsa. **30** İsa hê negihijtibû gund, Ew şunda ku Marta rasti Wi bû, hê lı wê bû. **31** Ew cinarê ku tev Meryemê mal de man û Yahûdiyê ku bo taziye lı wê bûn, dema ku wan dit Meryem bî lez derket der; wan gct Meryem tere ser mezela bîrayê

xwe û lı wê bigiri, ew ji lı dû Meryemê çûn.
32 Meryem gîhişt şunda ku Isa sekini bû û
wê Isa dit, xwe avîte lingê Wi û got: „Ya
Xudan“, eger „Tu lı vîr bûna, bîrayê mîn
nedîmir.“

33 Dema ku Isa dit, Meryem û ew Yahû-
diyê ku lı tev wê hatîbûn girin, dîlê Isa jan
da û Rîhê wi ji xemgin bû. **34** Isa got: „We
Lazar lı kû hîldanîn?“ Wan got: „Ya Xudan
were û mîzeke!“

35 Isa giriya. **36** Yahûdiyan got: „Mêze, Isa
ew mîrov çıqas hez dikir!“ **37** Feqet lı nav
wan de hîn kesan got: „Vi zati çavê koran
vekîr, ma wi nedîkariya ku Lazar ji jî mîrinê
xîlas bîke?“

Isa, Lazar jî mîrinê rakîr

38 Isa disa kûr naliya û gîhişt mezelê. Me-
zel mixarek bû, kevirek ji dêri de hebû.

39 Isa got: „Kevir bîlind bîkin!“

Xuşka Lazar Marta, jî Isa re wîsa got: „Ya Xu-
dan, ev çar roje ku mîriye û bihn ketiye wi.“

40 Isa got: „Mîn jî te re negot eger ku tu
iman bîki, tê izeta Xudê bîbini?“

41 Ser vê yekê wan kevir rakir. İsa çavê xwe rasti jor kır û wîsa got: „Bavê mîn, bona ku te ez bîhistim te re şikir dîkim.

42 Mîn zani ku tu her dem mîn dîbihizi. Feqet mîn ev bona van insanê lî vê derêne got ku, ew iman bikin ku te ez şandım e.“

43 İsa lî dû vê qise kîrînê re dengê xwe bîlind kîr û wîsa got: „Lazar were der!“

44 Mîri dest û lîngê wi pê paçan gîrêdayî û rûyê wi pê dîsmalê girti derket, (hat der). İsa jî wan re got: „Wi vekin û berdin bîla here.“

Plan kırına kuştına İsa

45 Wê demê ew Yahûdiyên hatîbûn ba Meryemê û dema ku wan xebata ku İsa çêkir dit, pîr kesi jî wan iman bî İsa ani.

46 Feqet lî nav wan de hînêñ dîn çûn ba Fêrisiyan û lî derbarê tiştê ku İsa çêkir xeber dan wan. **47** Lî ser vê yekê serokê Kahinan û Fêrisiyan Meclisa bîlind top kîrin û gotin: „Ma em çî bikin? Ev mîrov pîr mûcîze çêdike. **48** Eger em Wi wîsa bîhêlin, herkes wê imanê bî Wi bine û Rom jî wê

werin hem şuna me û hem ji mîletê me ji ortê ra kîn.“

49 Lî nav wan de yeki, serokê Kahinan Qayfa got, „hun qet tiştekê nîzanin.“ **50** „Şunda ku welat hemû tune dîbe, bîla tek mirovek oxıra gel de bîmire, ji bo me pîtîr rînde. Ma Hun vina fehm nakîn?“

51-52 Wi ev bî xwe û xwe negot. Lê belê ji bo ku wê salê ew serokê Kahinan bû, derbarê İsa de peyxamberti kîr û wîsa got: İsa bo mîlet û ne ji bo mîlet tenê feqet bo hemû zarokên Xudê yên ku belav bûne, wan top û yek bike, bo wê yekê gerek İsa bîmire. **53** Wîsa lî dû wê rojê re, plan kîrin ku ew İsa çawa bîkujîn.

54 Bo vê yekê êdi İsa lî nav Yahûdiyan de eşkereyi negeriya. Ew ji wê veqetiya û çû nêzikê çolê, bajarê Efraim. Ew tev şagirtên xwe lî wê derê ma. **55** Cejna Yahûdiyan ya derbazbûnê (yanê ya pasoxê) ji nêzik bû. Pîr kes ji bona pakîj bûnê, beri idê çûn Qudsa şerif. **56** Ew lî wê derê lî İsa geriyan. Dema ku ew hê ibadetxanê de bûn, hevûdu re wîsa pîrs kîrin: „Hun çi dîbêjîn? Ecêba İsa nawere idê?“

57 Serokê Kahinan û Fêrisiyan bo girtına
Isa emîr dan û gotin ku, ki şuna Wi zane
lazime ku xeberê bide.

İsa tere gundê Bêtanyê

(Met.26:6-13; Mer.14:3-9)

12 Isa, şeş rojan berêcejna derbaz-
bûnê hat gundê Lazar; yê ku Isa ew
ji mîrinê rakîribû. **2** Lî wê ji bo Isa ziyafet
çêkîrin. Marta xizmet kîr. Yênu ku lî tev Isa lî
sîfrê rûniştibûn yek ji wan Lazar bû. **3** Mer-
yemê niv litir rûnê pîr qimetli, ji rûnê sîm-
bîla Hindûstanê ani û lingê Isa re da û bî
pora xwe ji lingê Wi paqîj kîr. Ew mal bî
bihna wi rûnê xweş yê rînd tiji bû.

4-5 Ema şagîrtek yê Isa, yê ku Ew dû re
bîdana dest (dijmîn) Yahûda Isqaryot wîsa
got: „Çîma ev rûn bî sêsed dinaran nehat
fîrotinê û perên wi ji nedan feqiran?“ **6** Wi
ev bona feqiran negot, bona ku ew bî xwe
dîz bû got. Kisikê peran bî wi re bû û wi ji
perên kisikê de bûn, dîdiziya.

7 Isa got: „Jînîkê rehet berde.“ „Bîla vêna
bo roja ku mîn dîkin mezelê hîline. **8** Feqîr

tım û tım lı tev we ne, feqet ez tım lı tev we ninim.“ **9** Komekê Yahûdiyan yeki mezin bîhistin ku İsa hatiye gundê Bêtanyê û tenê bo İsa nine, bo ditîna Lazar yê ku İsa ji mîrînê rakırıbû ew hatin cem İsa. **10** Serokê Kahinan xwastin ku Lazar ji bîkujin. **11** Çimki bona Lazar pîr Yahûdi dîçûn û iman bî İsa dîkîrin.

İsa tere Qudsa Şerif

(Met.21:1-11; Mer.11:1-11; Lûq.19:28-40)

12 Dörtîra rojê, komeke insan ya mezin yênu ku hatibûn, û wan bîhist ku İsa ji were Qudsa şerif. **13** Wan guliyê xorme girt û berbi İsa çûn. Kîrîn qîrin û wîsa bang kîrîn, „Hozana! yê ku bî navê Xudan hatiye, meth kîrîn ji Qîralê Israil re be!“

14-15 İsa, sipek dit û lê siwar bû. Çawa ku kîtêba bîmbarek de hatiye nîvisin: „Netirse, qiza Sion! Mêze, Qîralê te siwar sipekê kerê bûye û tê.“

16 Şagirtên İsa berê ew tişt fehm nekîrin. Ema wexta ku İsa hat bîlind kîrînê, wan ev anîn bira xwe ku ew tişt ji bona İsa hatîne

nîvisin û xelkê ji ev ji bo wi çêkîrin.¹⁷ Ew xelkê ku dema Isa gazi Lazar kır û ew ji mîrînê rakîr lî wê ba Isa bûn, wan ji bo wina şehadeti kırın.¹⁸ Lî ser vê yekê xelk berbî Isa çû. Çîmki wan bîhist ku wi ev mûcîza çêkîribû. ¹⁹ Fêrisîyan ji ji hevûdu re wîsa dîgotin: „Hun dîbinin ji dest we qet tîştek nayê. Va ye tûm dînê lî dû Isa ketiye û dîce.“

İsa ji bo mîrîna xwe ji pêşta xeber da

20 Roja idê lî nav yên ku bo ibadet kırınê hatibûn Qudsa şerif hîn kesên Yûnan ji hebûn. **21** Vana hatin cem Filipûs, ew ji gundê Bajarê Celilê Bêtseydayê bûn, Wan ji Filipûs rîca kır û gotin: „Em dîxwazîn ku Efendi Isa bîbinin.“

22 Filipûs ji çû xeber da Andriyas. Andriyas û Filipûs ji çûn xeber dan Isa.

23 Isa wan re got: „Saeta ku Lawê insan were bîlind kırınê hat.“ **24** „We re bî rasti bî rasti dîbêjîm, heta ku teney genîm nekeve lî nav erdê û nemire, ew tenê dîmine. Feqet dema ku bîmîre zehf mehsûl dîde.

25 Yêñ ku canê xwe hezdikin, ew wi zay dîkin. Feqet yêñ ku dî vê dînê de jî canê xwe nefret bîke, wi jî bo heyata abedin hîltine. **26** Yê ku dîxwaze jî mîn re xîzmetê bîke, bîla lî dû mîn were. Ez lî kûderê me, xîzmetçiyê mîn ji lî wê derêye. Eger yek jî mîn re xîzmetê bîke, Bav wi dîde şeref kîrinê. **27** Nîha dîlê mîn teng bûye, ma ez çî bîbêjîm? Bîbêjîm, „Ya Bavê mîn, mîn ji vê saetê xîlas bîke?“ Ema ez jî bo vê arman-cê hatîm vê saetê. **28** Bavê mîn Navê xwe bîlind bîke!“

Lî ser vê yekê jor de deng hat bîhistin û got: „Mîn hem bîlind kîr û hem Ezê bîlind bîkîm.“

29 Ew xelkê ku lî wê derê bûn û koma ku ev bîhistin, wan got: „Ezman guregur kîr.“ Hînêñ dîn ji gotin: „Mîlyaket kê lî tev Isa qîse kîr.“ **30** Isa got: „Ev deng jî bo mîn nine, jî bo we hat.“ **31** „Ev dînê nîha tê hukum kîrinê. Qîralê vê dînê nîha wê bê avêtîn der. **32** Dema ku ez lî erdê bîlindê jor bûm, hemû insan dîkîşinim cem xwe.“ **33** Isa ev jî bo mirîna xwe û ew çawa bîmîre got. **34** Koma insan jî Isa re wîsa got: „Mîna ku

me Şeriatê de hu kiriye, gerek Mesih abediyen bimine. Tu çawa dîbêji ku ,Lawê insan bîlindê jor bibe?‘ Ev lawê insan ki ye?“

35 Isa got: „Ronahi hê demekê kurt lı nav we de ye.“ „Bona ku tari we pênegir e, heta ku ronahiya we heye bimeşin. Yê ku tariyê de dimeşin, ew nîzanin ku bî kû ve terin. 36 Hê Ronahiya we heyi, iman bî Wê bikin ku hun bîbin zarokên Ronahiyê.“ Isa jî wan re ev tiştên ha got û çû jî wan dûr ket û xwe veşart.

İnad kırına Yahûdiyan

37 Isa lı ber çavê wan pîr mûcize çêkir, feqet wan disa ji iman bî Wi nekîrin. 38 Vana hemû bona ku gotinê Yeşaya peyxamber werin şunê çêbûn:

„Ya Xudan ew xebera ku me da ye, ma ki pê iman kır? Ma quweta Xudan ki re hat nişan dan?“

39-40 Va ye bo vê yekê wan iman nekîr. Çawa ku Yeşaya peyxamber şunde ki dîn de ji disa dîbêje:

„Xudê çavê wan kor kır û dîlê wan ji hisk kır. Wîsa ku çavê wan nebîne, dîlê wan ji fehm neke û ew venegerin cem mîn û ez ji wan sax nekim.“

41 Yeşaya peyxamber ev tıştên ha gotine, ji ber ku wi izeta İsa ditiye û bo Wi qise kîriye. **42** Lı tev vina pîr mezîn û serokêن Yahûdiyan iman bî İsa anin. Feqet wan eşkereyi negot, bona ku wan dizaniya Fêrisi wan ji ibadetxanê bavêjin der. **43** Çimki wan meth kırına insan ji ya xudê zehftir hezkir.

44 İsa dengê xwe bîlind kır û wîsa got: „Yê ku iman bî mîn dîke, iman bî mîn nine, iman bî yê ku ez şandime dîke.“ **45** „Yê ku ez ditime, ew yê ku ez şandime dibine. **46** Kesê ku iman bî mîn dikin, bona ku ew qet lı tariyê de neminin, ez ronahiti hatim dînê. **47** Ew kesê ku gotinê mîn dibihizin û qebûl nakin, ez hukum lı wan nakim. Çimki Ez nehatime ku hukum lı dînê bikim, ez bo xîlas kırına dînê hatim dînê. **48** Yeki din heye Ew hukum lı wan kesê ku mîn qebûl nakin dîke. Kelama ku mîn got, roja dwiyê de hukum lı wi kesi dîke. **49** Çimki

mın bı xwe û xwe qise nekîr. Bavê mın yê ku ez şandım wi emîr da mın, ez çawa qise bîkim û çi bîbêjîm. 50 Ez zanim ku emîrê Wi jiyanâ abedin e. Jî bo vê yekê Ez çi bîbêjîm, mina ku Bav mın re dîbêje wîsa dîbêjîm.“

Temsila dîlnizminê

13 Beri cejna derbazbûnê bû. İsa zani ew saet hatiye ku, ew wê jî vê dînê veqete û here cem Bav. Dînê de yên ku aîdê wi bûn, Wi ew hez kîrin û heta dawiyê ji hezkîr. 2 Çaxê dîbû wexta xwarîna êvarê iblis xwestîna xwe kîr dîlê lawê Simon Yahudayê İsqaryoti ku, ew İsa bîde dest. 3 İsa zani ku Bav her tîst emanetê Wi kîriye û ew jî ba Xudê hat û disa vegere cem Xudê. 4 İsa jî sıfrê rabû, aba xwe dayni alikê û pêşgir girt lî pişta xwe pêça. 5 Dû re av kîr leganê û lîngê şagirtên xwe şuşt û dest pê kîr bî pêşgira ku dabû pişta xwe ji lîngê wan ziwa kîr.

6 Dor hat Simon Petrûs. Simon, jî İsa re got, „Ya Xudan, ma tê lîngê mîn bîşuyî?“

7 İsa, ji wi re wısa got: „Ez çı dıkım tu vê nıha nikari fehm biki, feqet dû re tê vê fehm biki.“

8 Petrûs, ji İsa re got: „Tu lıngê mın qet naşuyi!“ İsa got: „Eger ku ez te neşum, paya te lı tev mın nabe. **9** Simon Petrûs got: „Ya Xudan tenê lıngê mın nine, dest û serê mın ji bışu!“

10 İsa ji wi re got: „Yê ku hatine şuştinê tamamen paqıj bûne; xeyri lıngan lazım nine ku tiştekê dîn were şuştinê. Hun ji paqıjin, feqet hemû paqıj ninin.“ **11** İsa zaniya ku ki Wi bide dest. Ji bo vê yekê got ku: „Hun hemû paqıj ninin.“

12 Dema ku İsa lıngê wan hemûyan şuşt, disa aba xwe lı xwe kır û çû lı sıfrê rûnişt. İsa ji şagırtên xwe re got: „Tiştê ku mın ji we re kır, ma hun wi fehm dıkın?“

13 „Hun ji mın re Mamoste û Xudan dibêjin. Hun rînd dıkın, ji ber ku ez Ew im.

14 Madem ku Ez Xudan û Mamoste me û disa ji mın lıngê we şuşt; hun ji mecbûrin ku lıngê hevûdu bışun. **15** Mın ev temsile da we ku hun ji hevûdu re mina mın bikin. **16** Ji we re bı rasti bı rasti dibêjim: Kole ji

efendiyê xwe mezintir nine. Yê ku hatiye şiyandin ji ji yê ku ew şandiye mezintir nine. 17 Madem ku hun van tiştan zanin, eger ku hun wan bikin hunê bextiyar bîbin!, (dîlgeş bîbin!)

Jı Isa re ihanet kırın

(Met.26:20-25; Mer.14:17-21; Lûq.22: 21-23)

18 „Isa got, ez ji bo we hemûyan nabêjim, yên ku mîn bijartîne ez wan nas dikim. Fe-qet bona ku nîvisa bimbarek ya ku dîbêje: „Yê ku nanê mîn xwar destê xwe bîlind mîn kîr“, were şundê ev hat çêkîrin. 19 Ez we re vana ji nîha ve dîbêjim ku, dema ev tişt çêbûn, hun iman bikin ku, ez Ew’im. 20 Jı we re bî rasti bî rasti dîbêjim, her kijani ez dişinim, ki ku wan qebûl bîke, mîn qebûl dîke. Ki ku mîn qebûl dîke, ew yê ku ez şandime qebûl dîke.“

21 Isa lî dû gotîna van tiştan re dî rihê xwe de tengasiki kûr bîhist. Isa ji wan re şehadeti kîr û got: „Jı we re bî rasti bî rasti dîbêjim, ji we yek mîn dîde dest.“

22 Şagirtan mîze hevûdu kırın, gotin ecê-

ba bo ki dîbêje û wan meraq kîr. **23** Şagirtteki xwe da bû singê Isa. Isa ew hez dîkîr. **24** Simon Petrûs işaret da wi şagirti ku ew pîrs bîke ku, Isa vê ji bo kijan şagirti dîbêje. **25** Wi ji xwe da bû singê Isa, jê pîrs kîr û got: „Xudan, yê ku te dîde dest ew ki ye?“

26 Isa got: „Ez pariyê nêñ newq bîkim û bîdîme kijani, ew e. Û dû re Wi pariyê nan newq kîr, û da lawê Simon Isqaryot Yahûda. **27** Yahûda çawa ku pariyê nan gîrt, İblis ket hundurê wi. Isa ji wi re got: „Tîştê ku tu dîxwazi bîki, zû bîke!“ **28** Yêñ ku lî ser sıfrê bûn, tu kesi fehm nekîr ku, Isa bona çî ev qise ji wi re got. **29** Bona ku kîsîkê pera bi Yahûda re bû, şagirtên dîn gotin ku belkê Isa ji wi re got: „Bo idê ji me re tîştê ku lazîme bîkire“, yan ji „tîştekê bîde feqiran.“ **30** Dema ku Yahûda pariyê nan gîrt, ew hema derket der. Û Şev bû.

Hevûdu hez bîkin

31 Dema ku Yahûda çû der, Isa got: „Lawê insan nîha hatiye bîlînd kîrinê.“ „Xudê dî wi

de bîlind bû. 32 Bona ku Xudê dî Wi de hatiye bîlind kîrînê, Xudê ji wê wi lî cem Xwe bîde bîlind kîrînê, û hema bîlind bîke. 33 Zarokno! Ez hê demek kurt lî ba we me. Hunê lî mîn bigerin, feqet mina ku mîn ji Yahûdiyanre got, niha we re ji dîbêjîm, şuna ku ez terim hun nîkarin werin lî wê derê. 34 Ez ferman kê nû dîdîm we: Hevûdu hez bikin. Mina ku mîn hun hez kîrin, hun ji wîsa hevûdu hez bikin. 35 Eger ku hezkırına we ji hevûdu re hebe, wê çaxê herkes wê fehm bîke ku hun şagirtên mîn in.“

Petrûs İsa inkar dîke

(Met.26:31-35; Mer.14:27-31; Lûq 22:31-34)

36 Simon Petrûs ji İsa re got: „Ya Xudan, ma tu kû ve teri?“ İsa ji wi re got: „Şunda ku ez terim, tu niha nîkari lî dû mîn weri lî wê, feqet dû re tê weri.“

37 Petrûs ji Wi re got: „Ya Xudan, ma çîma ez niha nîkarım lî dû Te werim? Ez ji bo te canê xwe bîdîm!“

38 İsa ji wi re wîsa got: „Tê ji bo mîn canê

xwe bîdi? Te re bî rasti bî rasti dîbêjîm: Heta ku tu mîn sê caran inkar neki, dik bang nade.“

İsa rê ya ku tere ba Xudê ye

14 Bîla dîlê we teng nebe. Bî Xudê iman bîkîn, bî mîn ji iman bîkîn. 2 Mala Bavê mîn de pîr mesken, (cih) hene. Eger ku wîsa nebûna, mîn ji we re bigotana. Çîmki ez terîm da ji bo we cih hazır bîkim. 3 Bîçim, ji we re cih hazır bîkim û ji ber ku hun ji lî wê bin dera ku ez lê me; ez disa werîm û we bigirîm ba xwe. 4 Hun rê ya şunda ku ez terîm zanin.“

5 Tomas ji İsa re got: „Ya Xudan, em nîzanın ku tu kû ve teri, ma em rê çawa bîzanın?“

6 İsa ji wi re got: „Rê, rasti û jiyan ez im.“ Ne bî rêberiya mîn be, qet kes nîkare were cem Bav, (Xudê). **7** Eger ku we ez nas bîkîrama, we Bavê mîn ji nas bîkîrama. Ji nîha ve hun Wi nas dîkîn, û we Ew dit.“

8 Filipûs got: „Ya Xudan, Bav nişan me bîde, û ew ji me re bes e.“

9 İsa got: „Filipûs, ez ev qas zemane lı tev we me, ma te ez hê nas nekîrim e? Ki ku ez ditim e, wi Bav ji ditiye. Tu çawa dîbêji ku: ,Bav nişanê me bîde?’ **10** Tu bawer naki ku, ez bî Bav re me û Bav ji bî Mîn re ye? Gotinê ku jî we re dîbêjîm ez bî xwe û xwe nabêjîm, ema Bavê ku mîn de dîsekîne Ew xebatêن xwe dîke. **11** İman bî mîn bîkîn ku; ez Bav de me, û Bav ji Mîn de ye. Qet ne be bona van xebatan iman bîkîn. **12** We re bî rasti bî rasti dîbêjîm, ev xebatêن ku ez çêdikîm ewê ku bî mîn iman dîkîn ew ji dîkarîn van xebatan çêbîkîn, heta dîkarîn ku yên mezîntîr ji çêbîkîn. Çîmki ez terîm cem Bav. **13** Bona ku Bav dî Law de bîlînd bîbe, hun bî navê mîn çî bîxwazîn, ez çêbîkîm. **14** Eger ku hun bî navê mîn tîştek bîxwazîn, ezê wê bîkîm.

Wad kırına Rîhê bîmbarek

15 Eger ku hun jî mîn hez bîkîn, emîrê mîn binin şunê. **16-17** Ez ji jî Bav rîca bîkîm û Ew ji, Teselidar kê dîn, Rîhê heqîqetê, bîde we; wîsa ku Ew tîmi lı tev we bîsekîne. Dî-

nê nîkare Wi qebûl bîke. Çimki ew ne dî-kare ku Wi bîbîne, û ne ji Wi nas dîke. Hun Wi nas dîkin. Çimki Ew lî ba we dîsekîne û wê dî hîndurê we de bîbe. **18** Ez we sêwi nahêlinim, disa vedigerim cem we. **19** Hê Hînek zeman dîn dînê êdi mîn nabine, feqet hunê mîn bîbinin. Madem ku ez dîjim hun ji hunê bijin. **20** Wê rojê hunê fehm bîkin ku, ez Bav de me û hun bî mîn re ne û Ez ji bî we re me. **21** Ewê ku emîrêñ mîn bî wi re ne û wan tîne şunê, ew ji mîn hez dîke. Yê ku mîn hez dîke, Bavê mîn ji wi hez dîke. Ez ji wi hez dîkim û xwe nişanê wi dîdîm.“

22 Yahûdayê (İsqaryoti nine) ji İsa pîrs kîr û got: „Ya Xudan, çawa dîbe ku Tu xwe ji dînê re nine, ji me re nişan bîdi?“

23 İsa ji wi re wîsa got: „Ki ku ji mîn hez dîke, gotîna mîn dîke, Bavê mîn ji ji wi hez dîke. Em ji têñ ba wi û lî cem wi mesken çêdîkin. **24** Ki ku mîn hez neke gotînê mîn nake. Ev gotîna ku we bîhist ya mîn nine, feqet ya Bavê ku ez şandı me.“

25 „Ez hê lî ba we, mîn ji we re ev tîşt gotin. **26** Feqet Teselidar, Rîhê bîmbarek,

Yê ku Bav bı navê mın bisine, Ew wê jı we re her tiştê bide fehm kırinê û hemû gotinê mın bine bira we.“ 27 Jı We re selametiyê dîhêlinim, ez selametiya xwe dîdîm we. Ez mina ku dînê dîde nadîm. Bîla dîlê we teng nebe û netîrse. 28 We bîhist ku mìn jı we re got: „Ez terim, feqet disa werim ba we.“ Eger ku we jı mìn hez bîkîrana, bona ku ez terim cem Bav, hunê dîlşâ bîbûna. Çîmki Bav jı mìn mezîntir e. 29 Û bona ku dema ev tişt bîbîn, hun iman bîkîn, hê ev tişt nebûyin mìn nîha jı we re got. 30 Ez êdi lî tev we pîr tiştî qise nakîm; çîmki reisê vê dînê tê; û bî mìn re qet tiştekê wi tune. 31 Feqet bîla dînê bîzane ku, ez jı Bav hez dîkîm, û Bav çawa emîr dîde mìn, ez ji wîsa dîkîm. Rabîn, em jı vîr herin.

Mêwa rez û şîvên wê

15 „Ez mîwa rastîm û Bavê mìn jî rezvan e. 2 Her şîvmêwa ku bî mìn ve ye û meywe nadî, Bav wan jê dîke; û yên ku meywe dîdîn, bona ku hê zêde bîdîn wan paqîj dîke. 3 Bî gotîna ku mìn we re

gotiye, hun bı rasti paqij ın. 4 Hun bı Mın re bisekinin û ez ji bı we re. Eger ku şiv-mêw bı mewê ve nesekine, bı xwe û xwe nikare meywe bide. Mina vê, eger ku hun bı mın re nesekinin, nikarin meywe bıdın. 5 Ez mew im, hun ji şivmew ın. Kesê ku bı mın re disekine û ez ji bı wi re bisekinim ew pır meywe dibe. Çimki hun bê mın nikarin qet tiştekê bikin. 6 Eger kesek bı mın re nesekine, mina şivmewê davêjin der û hisk dibe. Wan top dikin davêjin agir û ew dişewitîn. 7 Eger ku hun bı mın re bisekinin û gotinê mın ji dı we de biskinin, wê çaxê hun her çı bixwazin wê ji we re were dayinê. 8 Dema ku hun pır meywe bıdın, Bavê mın bı vê bılındtir dibe. Hun wisa dibin şagirtên mın.

9 „Mina ku Bav ji mın hez kır, mın ji hun wisa hez kırın. Lı hez kırına mın de bisekinin. 10 Eger ku hun emirê mın binin şunê, hez kırına mın de dissekinin; mina mın emirê Bavê xwe anin şundê û hez kırına Wi de sekînim... 11 Mın vana ji bona ku şabûniya mın lı we de hebe û şabûniya we ji temam bibe gotin. 12 Emrê mın ev e:

Mina ku mîn hun hez kîrîn, hun ji hevûdu wîsa hez bîkîn. 13 Qet lî kesi de hez kîrîna ku canê xwe oxıra hevalê (dostê) xwe de bîde, ji wê hez kîrînê mezîntîr hez kîrîn tune. 14 Eger emrê ku mîn dane we hun wan bîkîn, wê çaxê hun dîbîn dostêni mîn. 15 Êdi ez ji we re nabêjîm xulam, çimki xulam nîzane ku efendiyê wi çi dîke; feqet mîn ji we re dost got; çimki hemû tîstê ku mîn ji Bavê xwe bîhist ji we re dan zanîn. 16 We ez nebijartîm, feqet mîn hun bijartîn. Mîn hun tayin kîrîn ku, hun herîn meywe bîdîn û meywe yê we ji baqi bîmine. Wîsa ku, hun bî navê mîn ji Bav çi bîxwazîn, Ew wê bîde we. 17 Ez vi emri dîdîm we, da hun hevûdu hez bîkîn!“

Nefret kîrîna dînê

18 Eger ku dînê ji we nefret bîke, bîzanîn ku beri we ji mîn nefret kîriye. 19 Eger ku hun daxîlê dînê bûna, dînê yênu ku daxîlê wi ne wan hez dîke. Madem ku, hun daxîlê dînê ninîn; encax mîn hun ji dînê vebijartîn e. Ji bo vê yekê dînê ji we nefret dîke. 20 Gotîna

ku mîn jî we re got, binin bira xwe: ,Xulam jî efendiyê xwe mezîntir nine.‘ Eger ku wan jî mîn zulum kırine, wê jî we re jî zulumê bikin; eger ku gotinê mîn qebûl kırine, ewê yên we ji qebûl bikin. **21** Feqet hemû van tiştan dî rûbalê navê mîn de wê bî we bikin, çimki ew wi yê ku ez şandime nas nakın. **22** Eger ku ez nehatîma û jî wan re negotana, gunehêن wan wê nebûna; feqet nîha bona gunehêن wan efûbûn jî wan re tune. **23** Kesê ku jî mîn nefret dîke, jî Bavê mîn jî nefret dîke. **24** Eger mîn xebatê ku kesi nekîriye lî nav wan de çênekîrina, gunehêن wan wê nebûna; feqet wan nîha hem ditin û hem ji jî mîn û Bavê mîn nefret kîrin. **25** Feqet ev bo gotina ku şeriata wan de hatiye nîvisin, were şunê bû: ,Bêsebeb wan jî mîn nefret kîr.‘ **26** Teselidarê ku Ez jî Bav jî we re bîşinim, Rîhê heqiqetê, dema ku were, Ew wê jî bo mîn şehadeti bîke. **27** Hun jî şehadetyê bikin. Çimki hun jî dest-pêkê ve lî tev mîn bûn.

16 Mîn ev tiştên ha jî we re gotin ku, hun tîlpeki nebin. **2** Wê we jî iba-

detxanan bıkın der. Erê, saet tê, herkesê ku we díkujin zan díkın ku ew jî Xudê re xizmetê díkın. 3 Ü Ew wê van tiştan bıkın, çimki wan ne Bav nas nekîr û ne jî ez nas kîrim. 4 Feqet mîn ev tişt jî we re gotin da çaxê saeta wan bê hun wan binin bira xwe. Mîn ew tişt dî destpêkê de jî we re negotin. Çimki ez tev we bûm.

Şuxul kırına Rihê Bimbarek

5 Lê belê nîha ez terim cem yê ku ez şandım e; û lî nav we de qet kesek nabêje ku: ,Ma Tu kû ve teri?’ 6 Feqet bona ku mîn jî we re ev tişt got, dîlê we tiji keder bû. 7 Jî we re rastiyê dîbêjîm ku; çûyina mîn jî bo feyda we ye. Eger ku ez neçim, Teselidar nayê ba we. Eger ku ez biçim, Wi jî we re bışinim. 8 Ü dema ku Ew were, jî dînê re guneh, rasti û hukum kîrinê nişan bide. 9 Jî bona guneh, çimki bî mîn iman nakîn. 10 Bona rastiyê, çimki ez terim cem Bav û hun êdi mîn nabinin. 11 Jî bona hukum kîrinê, çimki reisê vê dînê hatiye hukum kîrinê.

12 Jı we re hê pır gotinê mîn hene, feqet hun nîha nîkarın ku wan ragırın. **13** Feqet Ew, Rîhê rastiyê were, Ew wê rê ya her heqiqetê nişan we bîde; Ew bî xwe û xwe qise nake; feqet ew çî bîbihize dîbêje û hatîna tiştê pêşende xeberê bîde we. **14** Ew wê mîn bîlind bîke. Çîmki Ew wê jî yê mîn bigire û xeberê bîde we. **15** Her çî tiştê Bav heye, ew yê mîn e. Jî bo vê mîn jî we re got: „Ew wê jî yê mîn bigre û bîde we.“ **16** Zemanek kurt, û hun mîn êdi nabinin; û disa zemanek kurt, û hunê mîn bîbinin.

Elema we dîbe şabûni

17 Wê çaxê hîn şagirtên wi jî hevûdu re wîsa gotin: „Zemanek kurt, û hun mîn nabiñin, û disa zemanek kurt, û hunê mîn bîbiñin, û: Çîmki ez terim cem Bav. Ma ew çî ye ku jî me re dîbêje?“ **18** Wîsa ku: „Zemanek kurt got, ev çî ye? Em nîzanin ku, Ew çî dîbêje.“

19 İsa fehm kîr ku ew dîxwazîn jî wi pîrs bîkîn; û jî wan re got: „Mîn got zemanek kurt, û hun mîn nabiñin, û disa zemanek

kurt, û hunê mîn bîbinin. Ma hun jî bo vê gotinê jî hevûdu pîrs dîkîn?“ **20** Ez jî we re bî rasti bî rasti dîbêjîm: „Hunê bigirin û lî xwe bîdîn, dînê jî wê kîf bîke. Hunê kederê bîkişînin, feqet kedera we wê bîbe şabûni. **21** Dema ku jînîk zarok tîne dînê êş dîkişine. Çimki saeta wê hatiye. Feqet dema ku zarok ani dînê, bona ku insanek ani dînê, ew şabûn dîke û êşa xwe jî bir dîke. **22** Mîna vê temsilê nîha kedera we heye , feqet ezê we disa bîbinim û dîlê we şabîbe. Û şabûniya we kes nîkare jî we bigir e. **23** Wê rojê hun tu tîst jî mîn napîrsin. Jî we re bî rasti bî rasti dîbêjîm: Bî navê mîn hun jî Bav çî bîxwazîn, Ew wê bîde we. **24** Heta nîha We bî navê mîn tu tîst nexwest. Bîxwazîn, û hunê bigirin. Wi-sa ku, şabûna we temam bîbe.

25 Mîn jî we re ev tîstêñ ha bî meselan gotin; saet tê ku, ez êdi jî we re bî meselan nabêjîm; feqet derbarê Bav de Ezê jî we re bî eşkereyi bîdîm zanîn. **26** Ez nabêjîm, dî wê rojê de hunê bî navê mîn bîxwazîn; û ezê jî bo we jî Bav bîxwazîm. **27** Çimki bona ku hun jî mîn hez dîkîn û we iman kîr

ku ez jı Bav derketim û hatım e, Bav bı xwe ji ji we hez dike. **28** Ez jı Bav derketim û hatım dinê. Nıha ji dinê berdídım û vedi-gerím cem Bav.“

29 Şagırtan got: „Va ye, tu nıha eşkereyi díbêji û qet bı meselan qise naki.“ **30** „Em nıha fehm díkın ku tu hemû tiştî dizani. Hewce nine ku kesek jı te bipirse. Em jı bo vê iman díkın ku tu jı Xudê hati.“

31 İsa jı wan re got: „Ma hun nıha iman díkın?“ **32** „Va ye, saet tê, erê, ew saet hatiye û hunê mìn tenê berdin, belav bıbın û her yek jı we wê here cem yên xwe. Feqet ez tenê ninim, çımkı Bav lı tev mìn e. **33** Bona ku sılameta we bı mìn re hebe, mìn ev tişt jı we re gotin. Dı dinê de kedera we heye. Feqet cesûr bıbın. mìn dinê mexlûb kır!“

İsa Dua kır

17 İsa ev tişt gotin; çavê xwe bılındê rûyê ezman kır û wısa got: „Ey Bav, saet hat. Lawê xwe bılınd bıke ku, Law ji te bılınd bıke. **2** Çımkı te lı ser hemû beşe-

rê de selahiyet da Wi. Ta ku, Ew jiyana abedin bide hemû kesên ku te dane wi. 3 Jiyana abedin ji ew e ku, ew tek Xudê yê rastiyê te û yê ku te şandiye Isa Mesih nas bikin. 4 Bı temam kırına xebata ku te jı bo çêkîrînê da mın, mın tu lı ser rûyê erdê bîlînd kiri. 5 Ü, ey Bav, dema ku dînê hê tune bû û izeta mın ya ku lı ba te bû, nîha bı wê mın lı cem xwe bîlînd bîke.“

6 Jı dînê ew mîrovêñ ku te dan mın, jı wan re mın navê te nişan da. Ew yê te bûn, te ew dan mın û wan soza te qebûl kîr. 7 Ew nîha zanın ku hemû tiştê te dan mın, ew ji te ne. 8 Çîmki sozê ku te dan mın, mın ji dan wan; û wan ji qebûl kîr. Wan bı rasti fehm kîr ku ez ji te derketim û hatim. Wan iman kîr ku, te ez şandım e. 9 Ez ji bo wan rîca dîkim; ji bo dînê nine, feqet ji bo yên ku te dan mın rîca dîkim. Çîmki ew yên te ne. 10 Hemû tiştêñ mın yên te ne, yên te ji yên mın in; û ez dî wan de hatim bîlînd-kîrin. 11 Ez êdi ne dî dînê de me, feqet ew dî dînê de ne, û ez têm ba te. Ey Bavê bîmbarek, ew kesê ku te dan mın bı navê xwe bîparêzine ku, ew ji mina me bîbin

yen. **12** Dema ku ez ba wan bûm, mîn ew
bî navê te yê ku te dabû mîn hêvişandin
(parastin). Bona ku soza bimbarek were
şundê; ji xeyri lawê mîrinê, ji wan kesek
dîn helak nebû.

13 Feqet ez nîha têm ba te. Ez van tiştan dî
dînê de dîbêjim ku, şabûniya mîn dî wan
de temam bîbe. **14** Mîn soza te da wan û
dînê ji ji wan nefret kîr. Çimki çawa ku ez ne
daxîlê dînê me, ew ji daxîlê dînê ninin.
15 Ez bona ku tu wan ji dînê rabîki nine,
bona ku tu wan biparêzini rîca dîkim.
16 Çawa ku ez ne daxîlê dînême, ew ji
daxîlê dînê ninin. **17** Wan bî rastiyê bimbarek
bîke. Û soza te heqiqet e. **18** Mîna ku te
ez şandım dînê, mîn ji ew wîsa şandin dînê.
19 Dî oxîra wan de ez xwe teqdis dîkim ku,
ew ji bî heqiqetê bêñ bimbarek kîrin ê.

20-21 Tenê ji bo wan nine, feqet ji bo yêñ
ku bî soza wan bî mîn iman bikin ji, bona
ku hemû yek bibin, rîca dîkim. Çawa ku,
ey Bav, tu bî mîn re yi û ez ji bî te re me,
ew ji bî me re bin ku, dînê iman bîke ku te
ez şandım e. **22** Izeta ku te da mîn, mîn da
wan ku, ew ji mina me yek bibin. **23** Ez bî

wan re, û tu ji bı mın re, wısa ku hemû ji bona yekitiyê témam bıbın ku; dînê fehm bıke te ez şandım û mina ku mın hez diki wısa wan ji hez diki. **24** Ey Bav, ez dıxwazım yêñ ku te dane mın, ew ji lı şuna mın de lı tev mın bıbın ku, ew izeta mın ya ku te da mın bıbinin. Çimki te ez beri çêbûna dînê hezkırim. **25** Ey Bavê adıl, dînê tu nas nekiri, feqet mın tu nas kırı; û wana ji zanın ku te ez şandım e. **26** Bona hezkırına te ya ku ji bo mın heye, dı wan de ji be, û ez ji bı wan re bım; mın navê te ji wan re da zanın û ezê bıdım zanın ê.

İsa tê gırtınê

(Met.26:47-56; Mer.14:43-50; Lûq.22:47-53)

18 İsa dû gotına van tiştan re derket û lı tev şagırtên xwe çû wi aliyê newala Kidron ê. Lı wê derê baxçek hebû. İsa û şagırtên xwe hatın nav wi baxçe yi. **2** Èwê ku İsa da dest Yahûda ji ew şunde dizaniya. Çimki İsa û şagırtên xwe lı wê derê hevûdu pır caran dıditin. **3** Bı vi awayi Yahûda, givalek esker û memûr ji serokê

Kahinan û Fêrişîyan girt û hat wê derê. Des-tê wan de fanos, meşhele û sileh hebûn.

4 Isa, hemû tiştê ku bîhatına serê wi dîzaniya. Derket pêşiyê jî wan pîrs kîr û got: „Ma hun lî ki dîgerin?“

5 Wan jî got: „Lî Isa yê Nîsreti.“

Isa jî wan re got: „Ez im.“

Yê ku Ew da dest Yahûda ji bî wan re sekini bû. **6** Isa, dema ku jî wan re got:

„Ez im“, şunda çûn û ketin erdê.

7 Jî ber vê yekê Isa jî wan disa pîrs kîr û got: „Ma hun lî ki dîgerin?“

Wan got: „Lî Isa yê Nîsreti.“

8 Isa, jî wan re got: „Mîn jî we re got: Ku Ez im“. „Eger ku hun lî mîn dîgerin, vana berdin bîla herin.“ **9.** Jî ber ku gotina wi ya berê gotibû: „Ew kesên ku te dan mîn, qet kesek mîn wînda nekîr“, were şundê; wi wîsa got.“ **10** Şûrkê Simon Petrûs hebû, wi ew kişand û lî xîzmetkarê serokê kahinan xîst û kerîka wi ya rastê jê kîr. Navê wi xîzmetkari Malhûs bû.

11 Isa jî Petrûs re got: „Şûrê xwe bîke qa-lanê! Fincana ku Bavê mîn daye mîn, ma ez venexwîm?“

12 Bı vi awayi givale, serdar (qumandar) û memûrên Yahûdiyan İsa girtin û gîrêdan.
13 Wan İsa pêşı bîrin cem Henna; xezûrê Qayfa yê ku wê salê serokê kahinan bû.
14 Ewê ku şiret (nesihet) kır û jî Yahûdiyan-re gotibû; dî oxıra gel de mırına mirovekê jî bo me xêr e, Qayfa ev bû.

Petrûs İsa inkar dile

(Met.26:69-70; Mer.14:66-68; Lûq.22:55-57)

15 Simon Petrûs û şagırtteki dîn lî dû İsa çûn. Bona ku ew şagırt nasê serokê Kahinan bû, lî tev İsa ket hewşa serokê Kahinan. **16** Feqet Petrûs lî der ve, cem dêri de sekini bû. Ew şagırtê ku serokê Kahinan nas dikir, çû lî tev dergevan qise kır û wi Petrûs ji bir hindur. **17** Dergevan keçikê ji Petrûs re got: „Yan tu ji daxîlê şagırtên vi mirovi yi?“

Petrûs ji got: „Na, ez şagırtê wi ninim.“

18 Bona ku hewa sar bû, xizmetkar û memûran bî komîrê ağır vêxistibûn, û lî ber sekînibûn û xwe germ dikirin. Petrûs ji lî tev wan sekînibû û xwe germ dikir.

Pırs kırına serokê kahinan

19 Wê demê serokê kahinan, ji bona şagirt û hu kırına İsa, jê pırs kır. **20** İsa ji wîsa got: „Mîn ji dînê re eşkereyi got. Mîn tîm ibadetgeh û ibadetxaneyên ku hemû Yahûdi kom dîbin ders da; û mîn veşarti tu tîşt negot. **21** Ma çîma tu ji mîn pırs dîki? Yênu ku qise kırına mîn bîhistîne, ji wan pırs bîke. Ew zanin mîn çı gotin e.“

22 Û lî dû gotina van tîştan re, lî nav wan memûrê ku lî wê derê sekînibûn yeki ji İsa re got: „Ma Tu ji serokê kahinan re wîsa cewab dîdi?“ û şamarek lê xist.

23 İsa ji wir re got: „Eger ku mîn nerast gotiye, bo nerastiyê şehadeti bîke; eger ku raste, ma tu çîma lî mîn dîxi?“

24 Jî ber vê yekê Henna Ew gîrêdayi şand cem serokê Kahinan Qayfa.

Petrûs İsa disa inkar dîke

(Met.26:71-75; Mer.14:69-72; Lûq.22:58-62)

25 Simon Petrûs hê cem ağır sekini bû û xwe lî wê derê germ dîkir. Wan ji Petrûs re got: „Ma tu ji şagirtê Wi nini?“

Petrûs inkar kır û got: „Na, ez şagirtê Wi ninim.“

26 Xızmetkarkê serokê Kahinan, lı tev wi xızmetkarê ku Petrûs kerik jê kırıbû eqrebe bûn. Wi xızmetkari jı Petrûs re got: „Ma mîn lı nav baxçe de tu jı tev wi nedîti?“

27 Petrûs disa inkar kır û derhal dik bang da.“

Pırs kırına Pilato

(Met.27:1-2,11-31; Mer.15:1-20; Lûq.23:1-5,13-25)

28 Sîbê de zû Yahûdiyan Isa lı cem Qayfa girtin û bîrin qonaxa hukumatê. Jı ber ku mîrdar nebîn feqet nanê derbazbûnê bix-warına, ew neçûn hindur qonaxa hukumatê. **29** Jı ber vê yekê Pilato derket, hat cem wan û got: „Ma hember vi mîrovi şikayeta we çi ye?“

30 Wan jı Pilato re wîsa got: „Eger ev mîrov xîrabi nekîrana, me ew jı te re netaniya.“

31 Pilato jı wan re got: „Hun wi bigirin, lı gora şeriata xwe wi hukum bikin.“

Yahûdiyan jı Pilato re got: „Jı me re ne cai-ze ku em keseki bikujin.“

32 Jı bo ew işaret bıkın ku İsa bı çı şıklê mırinê bımre, da ew gotına ku İsa gotübû were şundê, ev çêbûn.

33 Pilato disa çû hindur qonaxa hukumatê. Wi bang İsa kır û Jê re got: „Ma qralê Yahûdiyan tu yi?“

34 İsa wisa got: „Tu vêna bı xwe dîbêji, yan kesên dîn jı bo mîn jı te re gotin?“

35 Pilato got: „Ma ez Yahûdi me?“ „Xelkê Te û serokê Kahinan tu teslimê mîn kîrin. Ma Te çı kîriye?“

36 İsa got: „Qraltiya mîn lı vê dînê nine.“ „Eger ku Qraltiya mîn lı vê dînê de bîbûna, xîzmetkarêñ mîn wê lı hember Yahûdiyan bîxebitina ku ez neketam dî destêñ wan de; feqet nîha qraltiya mîn lı vir de nine.“

37 Pilato İsa re got: „Ma balê Tu Qral i?“ İsa got: „Tu dîbêji ku ez Qral im.“ „Ez bona vê bûm e, û hatîme dînê ku jı bo rastiyê şehadetyê bîkim. Hemû kesê ku rastiyê de ne, ew dengê mîn dîbihizin.“ 38 Pilato jı İsa re got: „Ma rasti çiye?“

Dû vê pîrsê re Pilato disa derket, çu cem Yahûdiyan. Jı Wan re got: „Ez lı wi de qet sîceki nabinim.“ 39 „Feqet cejna derbaz-

bûnê de ez tîm jî bo we keseke (serbest) berdîdim û ev adeta we ye; ma hun dixwazîn, ez Qralê Yahûdiyan jî bo we berdîm?“
40 Jî ber vê yekê disa kîrîn qîrin û gotin: „Vi mîrovi nine, feqet em dixwazîn ku tu jî me re Barabbas berdi!“ Hal bû ko Barabbas haydut bû.

Tacê stîrin

19 Wê çaxê Pilato İsa girt û lêxist. **2** Es-keran jî stîriyan tacek vegirtin û dane serê Wi. Dû re xeftanek mor jî wi re dan xwe kîrîn ê. **3** Ew hatin ba wi û gotin: „Biji Qralê Yahûdiyan!“ û ew şîlpax kîrîn.
4 Pilato disa çû der û wan re got: „Va ye, mîn ew jî we re ani der ku, hun bîzanîn mîn lî wi de qet sîcek neditiye!“
5 Lî ser vê yekê İsa, tacê stîrin lî seri bû, xeftanê mor ji xwe kîribû û çû der. Pilato jî wan re got: „Va ye, ew mîrov!“
6 Dema ku serokê kahinan û memûran ew ditin, qîrin kîrîn û gotin: „çarmixê bîxine, çarmxê bîxine!“
Pilato jî wan re got: „Hun wi bigirin û bî

xwe wi lı çarmîxê bixinin!“ Çimki, „mın wi de qet sucek nedit!“

7 Yahûdiyan jı wi re wîsa gotin: „Qanûnek ya me heye; lı gora wê qanûnê gerek e ew bîmir e. Çimki wi got ku ez Lawê Xudê me.“

8 Pilato dema ku ev gotin bîhist, hê bêtir tîrsiya. 9 Ü disa çû qonaxa hukumatê û jı Isa re got: „Tu jı kû yi?“

Isa bersiv neda wi.

10 Pilato jı jı wi re got: „Ma Tu bî mîn re qise naki?“ „Ma Tu nîzani ku, jı bo berdanna te selahiyeta mîn heye, û jı bo xaçkırına te jı selahiyeta mîn heye?“

11 Isa jı wi re wîsa got: „Eger ku te re jı jor de nehatîbûya dayinê, qet selahiyeta te lı ser mîn wê tune bûya.“ „Jı ber vê yekê, yê ku ez teslimê te kırim, gunehê wi hê mezintir e.“

12 Jı bo vê yekê Pilato xweste ku Isa berde. Feqet Yahûdiyan kırın qırın û gotin: „Eger ku tu vi Mirovi berbidi, tu dostê Qeyser (Sezar) nini!“ „Ki ku bîbêje ez Qralım, ew hember Qeyser derketiye.“

13 Pilato jı dema ku ev gotin bîhist, wi Isa

derxist der. Lı şuna ku navê wê kevir raxistin – feqet bı İbrani Gabbata ye – lı ser kursiyê hukum kırınê de rûnişt. **14** Ew roj tedarık kırına cejna derbazbûnê bû. Saet devdevi şeşan bû. Pilato ji Yahûdiyan re got: „Va ye, Qralê we!“

15 Feqet wan kır qırın û got: „Wi rabike! û çarmixê bixinne!“

Pilato ji wan pırs kır û got: „Ma ez Qralê we çarmixê bixinim?“

Serokê Kahinan cewab dan û gotin: „Xeyri Sezar Qralê me tune!“ **16** Wê gavê Pilato Isa teslim wan kır ku, ew wi lı çarmixê bixinin.

Xaçkırina Isa

(Met.27:32-44; Mer.15:21-32; lûq.23:26-43)

17 Wê demê eskeran Isa girtin; Wi, xacê xwe girt û çû şunda ku navê wê hestiyê seri bû û – bı İbrani ji Golgota ye. **18** Wan ew lı wê dêrê çarmixê xistin. Lı tev Isa du mirovê dîn ji çarmixê xistin; Isa navinê de, yên dîn ji yek lı aliyê rastê û yek ji lı aliyê cepê de çarmixê xistin. **19** Pilato levhek ji

nîvisand û ew lı ser xaçê de dar xist. Wi wîsa nîvisand.

,Îsa yê Nîsreti, Qralê Yahûdiyan!‘

20 Îsa yê Nîsreti, Qralê Yahûdiyan! Şunda ku Îsa lı çarmixê xistibûn, nêzikê bajêr bû. Wîsa nîvisa ku bî zimanê İbrani, Latin, Yûnani hatibû nîvisandinê, pîr kesên Yahûdi ew xwandın. **21** Jî ber vê yekê serokêñ kahinêñ Yahûdiyan jî Pilato re gotin: „Qralê Yahûdiyan nine“, feqet wîsa bînîvisine: „Vi mirovi bî xwe got, Ez Qralê Yahûdiyan im.““

22 Pilato jî Yahûdiyan re got: „Mîn çi nîvisiye, ew hatiye nîvisandin.“

23 Dema ku eskeran Îsa lı çarmixê xist, kîncêñ Wi jê girtin. Wan ew kîr çar hêse ku, her yeki re hêsek bîkeve. Kîrasê Wi ji girtin. Ew kîras qumaşek ser bî ser bê dîrûn bû. **24** Wan ji jî hevûdu re gotin: „Em vîna qîş nekîn, feqet em bo vi vijag bavêjin ku hela ew hêsa ki dîkeve.“

Ew bona ku ev nîvisina bîmbarek were şunê hat çêbûnê:

Esker kîncêن Isa navbere xwe de pardikin

„Wan kîncên mîn lî navbera xwe de par ve
kîrin, lî ser kîrasê mîn vîjag avêtin.“

Eskeran ew tîst kîrin. **25** Lî cem xacê Isa ji
dayêka wi û xuşka dayêka wi, pireka Klo-
pa Meryem û Meryema Mejdelani sekînin
bûn. **26** Û dema ku Isa dêya xwe û ew şagîrtê
ku wi hez dikir dit, ji dêya xwe re got:
„Jînîkê, va ye, lawê te!“ **27** Dû re şagîrt re
got: „Va ye, dêya te!“

Jî dû wê saetê re wi şagîrtê, Meryem girt
mala xwe.

Mîrîna Isa

(Met.27:45-56; Mer.15:33-41; lûq.23:44-49)

28 Dû re, Isa êdi dizaniya ku nîha her tîst
temam bû ye, bona ku nîvisa bimbarek
were şundê, got: „Ez ti bûm!“ **29** Lî wê de-
rê qabek bî sirkê tiji hebû; sungerek bî sir-
kê tiji kîrin, guliya zûfêre kîrin û dan devê
Wi. **30** Dema ku Isa sirke girt, got: „Temam
bû!“ û serê xwe xar kîr û rîhê xwe da.

31 Bona ku roja hazır kırinê bû, jî ber ku ceset roja Sebtê dî xaçê de neminin, (çimki ew roja Sebtê rojekê mezin bû); Yahûdiyan jî Pilato rica kırın ku ew çêqê wan bîde şikandin û bîde helanin. **32** Wê demê esker hatin çêqê wan her du mirovê ku lî tev Isa hatibûn xackırinê şikandin. **33** Feqet dema ku ew hatin cem Isa, wan dit ku ew mîri ye. Bo wê yekê eskeran çêqê wi neşikandin. **34** Lîbelê, disa ji eskerkê pê rîm tenışta wi qul kîr. Jî tenışta wi hema xwin û av heriki. **35** Ew mirovê ku ev dit şehadeti kîr û şehadetiya wi ji rast e. Ew bî xwe zane ku wi rasti gotiye. Bona ku hun ji iman bikin, wi şehadeti kiri ye. **36** Çimki ew tîşt bona ku nîvisa bimbarek: „tek hestiki wi naşike.“ were şundê, çebûn. **37** Û disa nîvisekê dîn wîsa dîbêje: „Mirovê ku wan bedena wi qul kiri ye, wê mîze wi bikin.“

Hilanin û definkırına Isa

(Met.27:57-61; Mer.15:42-47; Lûq.23:50-56)

38 Pışti van tîştan şagîrtekê Isa, yê ku jî tîrsa Yahûdiyan xwe veşarti bû, jî Erime-

tiyê navê wi Üsîf bû, jî bo hîlanina cesedê Isa, jî Pilato rîca kîr û Pilato ji izin da. Ü Üsîf hat, cesedê Isa rakır. 39 Ew mîrovê ku pêşî bî şev hatîbû ba Isa, Nikodim ji nêzika sed litir mîska tevlîhev û darê zendeqê girt û hat. 40 Wê demê wan cesedê Isa girt lî ser adeta definkırına Yahûdiyan, ew tev bîharat lî caw pêçandin. 41 Şunda ku Isa lî çarmîxê xistibûn baxçek hebû, û dî nav wi baxçeyi de ji mezelek nû hebû ku, hê tu kes nekîribûnê. 42 Ü bona ku ew roj bo Yahûdiyan ya hazır kîrinê bû, wan Isa kîr wê derê; çîmki mezel nêzik bû.

İsa jî mîrînê radîbe

(Met.28:1-8; Mer.16:1-8; Lûq.24:1-12)

20 Dî roja heftiyê ya pêşî de zû, hê tari bû, Meryema Mejdelani hat mezelê. Wê dit ku kevirê derê mezelê de hatiye rakırın. 2 Wê demê ew revi hat cem Simon Petrûs û şagırtê dîn yê ku Isa jê hezdikir, û jî wan re got: „Xudan jî mezelê rakırine, û em nîzanin ku, ew kîrine kû derê.“ 3 Petrûs lî tev wi şagırtê dîn derketin û ber-

bı mezelê çûn. 4 Her du ji bı hevûdu re revin; feqet ew şagirtê dîn jî Petrûs pîtîr lez revi, û beri ew gehişt mezelê. 5 Wi xwe xar kîr mîze hîndurê mezelê kîr, paçê caw lî erdê raxisti dit; feqet neçû hîndur. 6-7 Wê demê lî dû wi re Simon Petrûs jî hat û ew çû hîndurê mezelê. Wi ew cawê ku lî erdê bû û dîsmala ku serê Isa pêcabûn dit. Dîsmal lî tev caw, (kefен) nebû, cê dî şunde kê dîn de lif kîr, (bı hevre pêçandi) sekini bû û wi ew wîsa dit. 8 Wê demê ew şagirtê dîn yê ku beri gehiştibû mezelê ji ket hîndur dit, û iman kîr. 9 Çimki wan ew nîvisa bîmbarek ya ku dîbêje Isa jî mîrinê radîbe, hê nedîzanin.

İsa jî Meryema Mejdelani re xuya kîr

(Met.28:9-10; Mer.16:9-11)

10 Wê wextê şagirt disa çûn mala xwe.
11 Feqet Meryem giriya û der ve cem mezelê sekini. Dema ku ew giriya xar bû û mîze hîndur mezelê kîr. 12 Wê du mîlyakettê ku kîncê sıpi lî xwe kîribûn dit; ew cem cesedê Isa, yek jî aliyê seri û yek jî aliyê

lîngan rûniştibûn. 13 Wan ji Meryemê re got: „Jînîkê tu çîma dîgiri?“

Wê ji ji wan re got: „Xudanê mîn rakırîne, û ez nîzanim ku ew kîrîne kû derê.“

14 Lî dû vê gotinê re, wê mîze paş xwe kîr û dit ku İsa lî vê sekini ye. Feqet Meryemê fehm nekîr ku Ew İsa ye. 15 İsa ji wê re got: „Jînîkê ma tu çîma dîgiri?“ „Ma tu lî ki dîgerî?“

Wê ji zen kîr ku Ew baxçevan e, û ji wi re got: „Efendi, eger ku te Ew bîriye, ji mîn re bîbêjê te Ew kîriye kû derê ez ji herim Wi rabikim.“

16 İsa ji wê re got: „Meryem!“

Ew ji vegeri û bî zîmanê İbrani got: „Rabbûni!“ mana Rabbûni, „Mamoste“ ye.

17 İsa ji wê re got: „Destê xwe nede Mîn!“ „Çîmki ez hê derneketime ba Bav; feqet tu here cem bîrayêñ mîn, û ji wan re bîbêje: „Ez derdikevîm ba Bavê xwe û Bavê we, ba Xudê yê xwe û Xudê yê we.

18 Meryema Mejdelani çû cem şagirtan. Ji wan re got: „Mîn Xudan dit!“ Dû re tiştê ku Xudan ji wê re gotibûn, wê ji ew şagirtan re gotin.

İsa jı şagirtên xwe re xuya kır

(Met.28:16-20; Mer.16:14-18; Lûq.24:36-49)

19 Ew roj, raja heftiyê ya pêşî de, dema ku êvar bû, derê mala ku şagirtên İsa tê de bûn jı tırsa Yahûdiyan girti bû; û İsa hat, lı nav wan de sekini û jı wan re got: „Selamet jı we re!“

20 Ev got, dest û tenışta xwe nişanê şagirtên Xwe dan. Şagirtan ji Xudan dit û dîlşa bûn. **21** İsa disa jı wan re got: „Selamet jı we re!“ „Mina ku Bav ez şandım e, ez ji we dışinim. **22** Dema ku wi ev got, pîfkîr wan û got: „Rîhê mıqaddes bîstînin! **23** „Hun gunehêñ ki efu bikin, ef dîbe; û hun gunehêñ ki efu nekin, ef nabın û dîsekînin.“

İsa jı Tomas re ji xuya kır

24 Tomas, yê ku jê re digotin, „Zo“ (Didimos) ew jı daxîlê dîwazdehan bû; û dema ku İsa hat ew lı tev wan şagirtên dîn nebû. **25** Wan şagirtên dîn jı wi re gotin: „Me, Xudan dit!“

Feqet Tomas jı wan re got: „Heta ku ez şu-

na mîxan dî destêن Wi de nebinim, û bê-
çiya xwe ji nedîm şuna mîxan, û destê xwe
ji nekim tenışta Wi, bawer nakim.“

26 Heyşt roj dû re, şagirtên Isa disa mal de
bûn. Tomas ji lî tev wan bû. Dema ku deri
girti bû, Isa hat lî nav wan de sekini û got:
„Selamet ji we re!“ **27** Dû re Tomas re got:
„Bêçiya xwe dîrêj bîke û mîze destê mîn
bîke; destê xwe ji dîrêj ke û bîke tenışta
mîn; û bêiman nebe, feqet bîiman bîbe!“

28 Tomas ji Wi re got: „Xudanê mîn û Xudê
yê mîn!“

29 Isa wi re got: „Te bona ku ez ditim iman
kîr; feqet xwezi bî wan yên ku nedîtin û
iman kîrine!“

30 Isa dî ber şagirtên xwe hê pîr mûcize
çêkir ku, ew dî vê kitêbê de nehatine nîvisin.
31 Feqet bona ku hun iman bîkin, Isa
Lawê Xudê Mesih e, û iman bîkin ku bî
navê Wi dî we de jiyan hebe, evêن ha
hatine nîvisin.

İsa tere cem golê

21 1-2 Dû van tiştanre, İsa dî tenışta gola Taberiyê de xwe disa nişanê şagırtan da; û ev ji wîsa çêbû: Simon Petrûs, şagırtê ku jê re „Zo“ dîgotin Tomas, jî gundê Celilê yê Kana de Natanyel, lawên Zebedi û du tene şagırtên Wi yên din ji bî hev re bûn. 3 Simon Petrûs jî wan şagırtên din re got: „Ez terim girtına masiyan.“

Wan got: „Em ji lî tev te werin.“ Ew derketin û siwarê qayixê bûn. Feqet wan wê şevê qet masi negirtin. 4 Dema ku bû sîbe, İsa tenışta golê de sekini bû. Feqet şagırtan fehm nekîrin ku, Ew İsa ye. 5 Ü İsa jî wan re got: „Zarokno, ma xwarinek we heye?“

Wan ji Wi re got: „Na“

6 İsa jî jî wan re got: „Torê berdin aliyê rastê, hunê bîbinin!“ Lî ser vê yekê wan berdan, û jî ber pîrbûna masiyan êdi wan nekarin ku torê kaş bikin. 7 Wê demê şagırtê ku İsa jê hez kîr, jî Petrûs re got: „Ev Xudan e!“

Simon Petrûs, dema ku bîhist Ew Xudan e, kîrasê xwe lî xwe kîr (çîmki ew tazi bû), û xwe avête golê. **8** Feqet wan şagirtên dîn, tora masiyan kaş kîrin bî qayixa pîçûk hatîn. Çîmki ew jî reşiyê nêziki du sed arşinan dûr bûn. **9** Dema ku ew der ketin, wan dit ku agîrê komîr dîşewîte, û lî ser agîr ji masi û nan heye.

10 İsa jî wan re got: „Nîha wan masiyê ku we gîrtîne binin.“

11 Ü Simon Petrûs sıwar qayixê bû, tor kaşê reşiyê kîr; tam sed û pênce û pênc masiyên mezîn lî torê de hebûn. Ev qas pîr masi torê de hebûn, disa jî tor qîş nebû. **12** İsa jî wan re got: „Werîn, xwarîna sîbehê bîxwin.“

Qet şagirkê cesaret nekîr ku jê pîrs bîke û bîbêje: „Ma Tu ki yi?“ Çîmki wan zanîn ku Ew Xudan e.

13 İsa hat nan gîrt, da wan; û wîsa masi ji da wan. **14** İsa piştî ku jî mîrînê rabû, nîha ev cara sisêya bû ku, Wi xwe jî şagirtên xwe re da xuya kîrin ê.

İsa, Petrûs û Yûhenna

15 Bi vi awayi dema ku wan nanê sibê xwar, İsa ji Simon Petrûs re got: „Ya Simon lawê Yûhenna, ma tu ji van hê pirtir ji mîn hez dîki?“ Simon Petrûs got: „Erê, ya Xudan, tu zani ku ez ji te hez dîkim.“

İsa ji ji wi re got: „Berxên mîn bîçêrîne.“

16 İsa cara dîduyan disa jê pîrs kîr û got: „Ey lawê Yûhenna Simon, tu ji mîn hez dîki?“

Wi ji got: „Erê, ya Xudan, tu zani ku ez ji te hez dîkim.“

İsa ji wi re got: „Miyêñ mîn bîçêrîne.“ 17 İsa cara sisêyan disa ji wi re got: „Ey lawê Yûhenna Simon, ma tu ji mîn hez dîki?“

Petrûs ji ber ku cara sisêyan İsa ji wi pîrs kîr: „Ma tu ji mîn hez dîki?“ Xemgin bû, û ji wi re got: „Ya Xudan, tu her tiştî dizani; û tu dizani ku, ez ji te hez dîkim.“

İsa ji Petrûs re got: „Miyêñ mîn bîçêrîne.“

18 Jî te re bî rasti bî rasti dîbêjîm: „Xortiya xwe de te xwe bî xwe gîrê dîda û kû ve bîxwestana tê bîçûwayî wê derê. Feqet dema ku tu kal bîbi tê destê xwe dîrêj bîki,

yenê dîn wê te gîrê bîde û te bîbe şunda
ku tu nexwazi heri.“ **19** İsa, jî bo işaret kırı-
nê ev got ku (Petrûs) bî mîrînek çawa Xu-
dê bîlînd bîke. Dû re jî wi re got: „Lî dû mîn
were.“

20 Petrûs mîze paş xwe kîr û dit ku ew
şagirtê ku İsa jê hez dîkîr lî dû wan dîhat.
Ew şagirt yê ku dema wan şîv dîxwarîn,
xwe dabû ber singê İsa û got: „Ya Xudan,
ewê ku te bîde dest ki ye?“ Ev ew e.
21 Petrûs ew dit û jî İsa re got: „Ya Xudan,
ma ev jî wê bîbe çı?“

22 İsa jî wi re got: „Eger ku ez bîxwazîm
ew bisekîne heta ku ez werim, ma te çı jî
vi ye? (Ma jî te re çı?) „Tu lî dû mîn were!“

23 Bî vi awayi: Lî nav bîran de gotin derket
ku, „ew şagirt namîr e.“ Feqet İsa negoti-
bû wi: „Ku ew namîr e.“ Lê belê Wi tenê
got ku: „Eger ku ez bîxwazîm ew bisekîne
heta ku ez werim, ma te çı jî vi ye?“ (Ma jî
te re çı?)

24 Yê ku jî van tiştan re şehadeti kîriye
û ev tiştîn ha nîvisiye, şagirt ev e; û em
dîzanîn ku şehadetiya wi rast e.

25 Hê pîr tiştê dîn yên ku İsa çekirin hene.

Ez bawerim ku, eger ew yek bı yek bıhatana nıvisin, kıtêbê ku bıhatana nıvisandın heta ko dînê de ji cih nedîbûn.